

Naverok

▪ Pêşgotin	1
▪ Lêkolîn û gotar:	
- 15 Stêr li eniya Pirsê	Rêberê Silîvî 3
- Rojnamegeriya Kurdî li Sûryê.....	Reşoyê Pirê 5
- Ziman li Ci.Kurmênc.....	Dr.Mihemed Elî 14
- Cegerxwîn (Festîvala Hewlêrê).....	Rezoyê Osê 17
▪ Wêje:	
- Vekolîn:	
Memûzîna Ehmedê Xanî 4/4	Rizgar Kurdaxî 22
Ilse Aichinger.....	Tengezarê Marênî 28
- Çêrok:	
Kurdî: Şivanê bêkêr.....	B.vînyar 31
Werger: Çawa Goltşo di diz derxist.....	Mistefa Henan 34
- Helbest:	
Min nizanî çi bû !!	Ebdilmecît Şêxo 38
Dawiya xwînvexaran.....	Merwan Berekat 40
▪ Pirtûkxana Kurdî:	
- Çiyayê Lêlûn di nînika.....	Merwan Berekat de 42
▪ Nameyên xendevanan:	
- Ji kovara Pirsê ya Hêja re.....	Dilsozê Dozê 47

www.kovarapirs@yahoo.com

Biha 50 L.S

Pêşgotin

Xwendevanên hêja !.

Ev jimara kovara we, kovara PIRSê, di heyva Adarê de roniyê dibîne û gelek bûyeran bi xwe re hiltîne.

Belê, bê çawa demsala buharê, nemaze miha Adarê, bi kêf û şahî ye, bi gul û nêrgiz e, bi cejn û seyran e, wilo jî bi kul, êş û jan e. Vê mihê xêr û xweşiya suruştê bi ser me de barandiye, lê dilên me jî êşandiye. Derbarî vê xweşi û sahiyê M.E.Xanî dibêje :

*Di fesla nûbuharê de , di gel dilber biçin geştê
Ji ew xoştir umur nabit, li min ev hal qewî xweş tê*

Lê, mixabin ku em di welatê xwe de û bi welatê xwe re tim xemgîn in, derd û azarîkêşanên me pir in, bê kenar in. Loma deng û rengê welatê me li me rû dide, me melûl berçav dike û omîdên me bi mij û moran dike, asoyên çakbîniyê li ber me bi tûman dike. Wilo, civak dibe yek gewd, ku deng û rengê xwe ji xaka welatê xwe werdigre. Lewra, Nasirê Rezazî bi goyîni dibêje:

*Ekem dengî zulalî to nebêt, minij lêrewe bê deng im
Ku xakekem rengî soralî to nebêt, minij lêrewe bê reng im*

Lê, bi ser van kartêkirinên ne normal de jî, em xwedî lephilanîn in û desthilat in, ku toz û gemara demê ji ser xwe dawêşînin, xwe di bin barên giran de nehêlînin û bi geşbîni kar, xebat û jiyana xwe berdewam dikin. Belê, rewşenbîrên me, bê westan, bi ser hin velukimandinan de jî, bi erkên xwe radibin û karên xwe bê texepaşî bi pêş ve dibin.

Yek ji wan gavên hêja û hizra payebilind ew bû, ku kovarên Kurdî li Sûriyê lihevbanîna xwe, di bin konê kevnorevanê xwe Cegerxwîn de, pêk anîn û bûne nimûne ji rewşenbîriya Kurdî re. Belê, kovaran mil li mil û dest bi dest bîranên 22 û 23 saliya koçkirina seyda Cegerxwîn, di salên 2006 û 2007 an de, li darxistin. Loma lidarxistina festîvala Cegerxwîn, di rojên 10-12/2/2008an, li Hewlêrê bû qezencek ji serkeftina rewşenbîriya me re. Ev festîvala banbilind û nirxbuha, li seranserê Kurdistanê bû nimûne ji lihevbanîna rewşenbîrî re, bû nîşana lixwepirsîna û bû durvê kar û xebata serkeftî.

Em, weku desteka kovara PIRSê, bi hêvî ne ku xwendevanên me, nivîserên me, rewşenbîrên me û hemî xêrxwazên pirsîna netewî bimînin destek, da li xwe, li kevnorevanên xwe û pirsîna xwe xwedî derkevin.

PIRS



15 Stêr li Eniya PIRSê



Rêberê Silivî

Hejmara yekem ji kovara **PIRSê**, di Newroza sala 1993 an de ronahî dîtiye, ango, 15 sal di ser waşan wê re derbas bûne. Di van salan de, komîta wê gelek kelem û astengî dîtine, çî di warê çapê de, çî jî di warê girêdana xwendevanên zimanê kurdî bi kovarê ve.



Mixabin ku di vê heyama me ya nûjen de, ku azadiya zimanan, azadiya gelan, azadiya mafê mirovan û mafê nerîn û derberînê di cîhanê de gihaye asteyeke bilind, hêjî zimanê me kurdan li me qedexe ye!!, em nikarin bi serbestî bi zimanê xwe di welatê xwe de bixwînin û binivîsin, kovar û rojnameyan pê biweşînin, bi rastî, ev yeka, cihê xemgîniyeke mezin e, li tu welat û tu deveran nema ye, ev yeka han, ji me re bûye kuleke giran, rêl û keleman li pêş pêşveçûna zimanê me yê şêrîn rêz dike, nahêle ew jiyana xwe ya normal bibîne.

Dîsa dibêjim mixabin ku rewşenbîrekî kurd li Sûriyê, dema bi zimanê dayika xwe dinivîse, ew li nik dezgehên dewletê cihê lêpirsîn û gomana ye, her wekî ew mirov karekî bive dike, wî dixine bin çavan, rabûn û rûniştina wî dişopînin.

Geşbûn û pêşveçûna ziman û wêjeya kurdî li Sûriyê, di naveroka xwe de, geşbûn û pêşveçûne ji wêje, tore û folklorê gelên Sûriyê bi tevayî re, pêşveçûn û zengînbûne ji toreyê netewî re, her weha, ew dewlemendiyeke ji tore û çanda cîhanê re jî. Ev ji hêlekê ve, ji hêla din ve, çawa em xwe bi toreyê Erebbî, Asûrî û Ermenî ... hwd bextewer û serbilind dibînin, girînge toreyê kurdî jî were rêzgirtin û cihê xwe li kêleka xwişkên xwe yê dîtir bibîne, bi her hawî arîkarî pê re bibe, da ku ew jî ronahiyê bibîne, ji bin mercên çavsorî û qedexekirinê derkeve.

Bi rêya zimên, bi rêya tore û wêjeyê, gelên me dikarin nêzîkî hev bibin, çanda biratî, azadî, aştî û hezkirina mirovan belav bikin, rê li pêş dek û dolabên kevneperst hişkabawer û quretiya millî bigirin.

Hewildanên windakirin û tunekirina zimanê kurdî, rajeya/xizmeta zimanê Erebbî û berjewendiya welatê me Sûryayê nekiriye û tucarî jî nake, ji bilî ku zimanê me di dil û canê me kurdan de kûr rehên xwe berdane, tu hêz, çiqasî bi hiner be, nikare wî ji dilê me derxîne û zimanekî din di şûna wî de cîwar bike, îro, bi sedê hizaran keç û lawên gelê me li zimanê xwe xwedî derketine, fêrî xwendin û nivîsandina wî bûne, ew xwe bi zimanê bav û kalên xwe serbilind dibînin, zimanê xwe ji zimanê gelên cîhanê qelstir û kêmtir nabînin, ew berhemên bav û bapîrên xwe yê kevin pê dixwînin.

Dema em ji zimanê xwe hez dikin, em dijberiya tu gel û tu zimanan nakin, berevajî wê, em rêz û rûmeta hemî zimanên dinyayê bilind diparêzin, daxwaza pêşketinê ji wan re dikin, çimku em bi piralî û pirengiyê bawerin.

Li dawiyê, em sipasiya hemî rewşenbîrên kurd dikin ku piştgirî û hêz dane kovarê, bi saya serê wan û xebata wan, çî li welêt û çî li derveyî welêt, kovar li ser lingan maye û hêjî berdewam e, hêvî û omîda me ew e, ku her ew bi pênûs û xameyên xwe yê delal, bi berhemên xwe yê şêrîn, rûpelên **PIRSÊ** bixemilînin.

ROJNAMEGERIYA KURDÎ LI SÛRIYÊ (*(Kovar û rojnameyên bi zimanê Kurdî)*)

*(Rojnamegerî bingehê herî xort e ji bo avakirina lengerên
şaristanî û avabûnê) ... N.Ponepert*

Nivîskar: Reşoyê Pîrê

Rojnamegerî, nêrîn û ramana gel e, daxwaz, pêdivî û armancên netewî diyar dike û dide xuyan.

Rola rojnamegeriyê ne tenê ji bo parastina dîrok, çand, ziman û her tiştê bi gel ve girêdayî girîng e, lê belê, ew bûyer û rûdawên di pêvajoya dîroka millet de bûne jî, diparêze. Ew ji bo parastin, pêşxistin û dewlemenkirina zimên, xwedî roleke pir berz e. Rojnamegeriya her miletekî vê rolê hildide ser milên xwe. Bi kurtî mirov kare bêje, rojnamegerî “ mirin û jiyana bi xwe ye”.

Gelê Kurd di rojhilata navîn de, kevnartirîn millet e, û roleke erênî di avakirina şaristaniya vê herêmê de lîstiyê. Ji bo maf û azadiya xwe jî, bi dehan raperîn û serhildan rakirine. Lê mixabin, dewleteke serbixwe ava nekir û

zimanê wî nebûye zimanê dewletekê.

Dagîrkerên welatê Kurdistan, bi her awayî kar kirine ku gelê Kurd ji holê rakin, çand û zimanê wî tune bikin û Kurdistan ji netewbûn û taybetmendiyên xweser bikin. Ji ber van sedeman jî, rewşa rojnamegeriya Kurdî diwartir bûye. Li hember vê zordariyê, Kurdhez, rewşenbîr û siyasetmedarên Kurd, ji bo vê riya pîroz pir caran giyanê xwe kirin qurban.

Pir kurdperwer, rewşenbîr û têkoşerên Kurd jî ji ber zulm û zora destlata Osmaniyan, penaberî dûriyê dibûn. Li dûriyê, merc, heyam û bûyerên nû peydabûne. Di wê rewşa neçariyê de û li gor wan merc û bûyeran, rewşenbîrên me çekên xwe guhêrîn, û çeka hişyarî, zanebûn, raman û zimanê dê rakirin.

• **Rojnama KURDISTAN:**

Di rewşa neçariyê de, li Misirê -Qahîre- şahsiwarê pyevê, mîrê gewre, Midhet Bedirxan dest davêje pênûsa xw, û kar û xebat rojnemevaniyê dike. Ew li 22ya



Nîsana 1898an, yekem rojname bi zimanê Kurdî bi navê (Rojnama Kurdistan) diweşîne. Li gor berpirsiyar û xwediye rojnamê, û mîna ku di hejmara yekê de nivîsiye, rojnama Kurdistan wê her (15) rojan were weşandin. Û herwiha ji 22ya Nîsana 1898 ra 1902an, 31 hejmar ji rojnamê weşandin, hejmarên (1 ra 5) li Qahêrayê, (6-19) li Cinêvê, (20-23) li Qahêrayê, (24) li Londin, (25-29) li Folkston û (30-31) jî li Cinêvê çapkir û belav kir.

Ji ber guhartina cihê wê, ev rojname, bi rojnama gerok hat nasîn. Lê mixabin, sozê xwediye rojnamê ji bo birêkûpêkirina deranîna wê de, ji ber merc û nîrên ku hebûn pêknehat. Piştî derçuna hejmara 5an ji rojnamê û belavkirina wê li nav Kurdan, Sulatnê Osmanî, bi çavsorî li hember rojnamê sekinî û bi destê

zorê, M.Bedirxan vedigere Stembûlê. Lewre, birayê wî mîr Ebdirehman, li Cinêvê berdewamiya derxistina rojnama Kurdistan kir. Wî di hejmara şeşan de weha dinivse: *((Ev cerîda birayê min Meqdad beg dertanî,*



lakên çiko xinkar nehêşt ew li Misirê ronît, vegera Istenbolê, cerîdeya xwe nikanî li Istenbolê derbînêt))).

Piştî ku Kemalîstan raperîna Şêx Se'îd, bi hovîtî hildiweşand, pir têkoşer, rewşenbîr û xebatkarên Kurd ji neçarî penaberî dûriyê bûn. Hinek ji wan derbas binxetê bûn, ji wan, C. Berdirxan, Dr. Ehmed Nafîz, Osman Sebrî, Ekrem û Qedrî Paşa, N. Dêrsimî, Nûridîn Zaza... û hwd. Destlata Firansî, ji bo parastina berjewndiyên xwe bi destlata Tirkiyê re, ew têkoşer, di bin mercên neçariyê de, li Şamê bi cîwar kirin.

Di ew rewşa neçariyê de, ew baş têdigihîştin, ku xebateke dût û dirêj divê, ji ber wê jî, çekên xwe diguhêrin.

Armanca bingehîn û pîrsa herî giranbiha û pêwîst, di jiyana

rûniştvanê Şamê, mîrê gewre, C.Bedirxan de, zimanê Kurdî bû. Wî hêvî dikir ku zimanê Kurdî bibe zimanê xwendin û nivîsandinê. Ji ber wê baweriyê, C.Bedirxan dest davêje pênûsa xwe û gava pêşîn, bingeha elfebaya Kurdî ya latînî datîne. Lê berî ku elfebaya xwe belav bike, ji alîkî ve, baş li ser elfebaya Erebi û Latînî radiweste û van cudahiyan diyar dike: *((Ev elfebaya (Erebî) welê ye, ku dengî dide xwendin ku nayêne nivîsandin û Latînî yekcar vajayê wê ye, herfina dide nivîsandin ku nayêne xwendin))*. Ji ber vê sedemê, biryara zêrîn bi derxistina elfebaya Kurdî - Latînî distîne.

Ji aliyê din ve, ji bo elfebayek pîvayî û zanistî, C.Bedirxan, guhdarî nêrîn û rayên bîrewerên Kurd dike û bi sîngekî fereh û bi dilxweşî rexne û nêrînên wan dipejirîne. Ji aliyê sisiyê ve, di sala 1930î de, li Şamê rewşenbîrê bi navûdeng Tewfîq Wehbê dibîne û herdu elfebayan didin ber hev, C.Bedirxan encama wê berhevdanê weha diyar dike: *((Di navbera wan de, ferqin hebûn, me dil kir di cî de, elfbayên xwe bigihînin hev û ji*

herdiwan elfebayekê vebjêrin û belav bikin)). Lê sedcar mixabin, pirojeya yekîtiya herdu elfebayan ne çû serî. Bîguman, ger ew piroje bi serî bûba, pirsra herî girîn û pêwîst, di dîroka zimanê kurdî dê dî bihata çareserkirin.

• Kovara HAWAR:

Xwedî û berpirsiyarê wê, rewşenbîr û zimazanê bi navûdeng, mîr Celadet Bedirxan e. Hawar li Şamê derket û li gelek deverên Kurdistanê hat belavkirin. Ronakbîr û rewşenbîrên Kurd bi dilşadî Hawar hembêz kirin û bi nivîsarên xwe rûpelên wê xemilandin.

Hejmara Hawarê ya pêşîn, di 15a Gulana 1932an de hatibû weşandin û ya dawiyê ya (57)an, di 16ya Tebaxa 1943an de bider ketiyê. Hêjayî gotinê ye ku, temenê Hawarê ne 11 sal in, ew kêmtirî 5 salan e, ji ber ku bêtirî carekê rawastiye. Lê mixabin xwediyê kovarê sedemên rawestandîne nedane xuyakirin.

Bîst û sê hejmarên pêşîn yê Hawarê, bi du elfebayan (Ereb û Latînî) hatibûn weşandin, ji hejmara 24 an û pê ve jî, tenê bi elfebaya latînî hatin weşandin.

Hawar armancên xwe di sergotara hejmara yekê de, weha bi xwendevanan dide nasîn: *((Hawar dengê Zanînê ye, zanîn xwe nasîn e, xwe nasîn ji me re riya felat û xweşiyê vedike, kesê ko xwe nas dike, dikare xwe bide naskirin. Hawara me berî heritştî, heyîna zimanê me dê bide nas kirin. Lewma ko ziman şerta heyînê ya pêşîn e. Hawar jê pêve bi her tiştê ko kurdanî û kurdîti pê berdewam e, dê mijûl bibe. Tenê siyaset jê dûr e, xwe naêxe siyasetê)).*



pê))? ((Di yekîtiya zimên de gava pêşîn, yekîtiya herfan e).

Hawar, bang li hemî Kurdan dike û jê dixwaze: *((Îro hînbûna xwendin û nivîsandina zimanê makder ji bo her miletekî, êdî ne bi tenê*

wezîfeyeke şexsî, lê wezîfeke milî ye jî . Hecî bi vê wezîfê ranebûye wezîfa xwe ya milî pêk ve ne anîne û bi kêrî miletê xwe jî ne hatine. Ji bona ko mirov bikare xwe ji miletekî bihesbîne divît bi kîrî wî bêt)).

Ji bilî elfebaya Kurdî, C.Bedirxan, xebateke din e pir hêja û pîroz kiriye, wî bingeha rêzimana Kurmancî daniye û ji zimanê nivîskî re bingeh û rêzikên rastnivîsandinê jî çêkirine.

• Kovara Ronahî:

Di yekê Nîsana 1942an de, zimanzanê hêja C.Bedirxan, li gel Hawarê, kovarek din, bi navê Ronahî diweşîne . Ev kovar ta sala 1945an berdewam dike . Hejmara 28an , di Avdara 1945an de weşiyê. Wek tê zanîn, ev kovar di dema şerê cîhanê yê diwem de derketiye. Ji ber wê jî,

Bi vê têngihîştinê, Hawar dest bi xebata xwe ya pîroz dike, armanc û daxwazên xwe bi xwendevanan dide nasîn. Bêguman berî hertiştî zanîn e, bi riya zanînê, mirov kane xwe bide nasîn, ango mirovê xwe nasbike hertişte û yê xwe nasneke jî netişt e.

Zimanzanê gewre C.Bedirxan, gava bingeha elfebaya nû datanî, armanca wî yekîtiya Kurdan bû: *((Di her tiştî de yekîti))* û herweha di zimên û elfebayê de jî dibêje: *((yekîtiya miletê Kurd bi yekîtiya zimanê Kurdî tete*

naveroka hejmarên wê, bi wêne û nûçeyên wî şerî hati bûn dagirtin. Tiştê herî balkêş, di hejmarên Ronahiyê de ew e, ku gelek mijar ji zimanên biyanî hatine wergerandin. Ev bi xwe jî dewlemendiyek pir li pêş bû. Lê mixabin, herdu kovar, wek tê zanîn ji ber sedemên siyasî û diravî radiwestin, û mîr Celadet ti agahiyên li derbarî wê yekê nedane xuyankirin.

• Kovara AGAHÎ:

Ev kovar wek birêz Dr. Ebdilmecît Şêxo û Dîlewer Zengî didin xuyan, hejmara yekem di sala 1966an de ronî dîtiye. Kovar weha xwe dide nasîn: ((**Kovareke siyasî, dîrokî, edebî serbixwe ye**)). Xwedî û berpirsiyarê wê birêz Hesên Hoşyar e. Hejmarên wê ji 15-23 rûpelan pêkhatiye. Vê kovarê ta sala 1985 berdewam kiriye û hejmarên wê gihane 20an, û ji bilî du helbest û namakê, hemû gotarên kovarê yê berpirsiyar in, helbestek jî ya helbestvan Ehmedê Palo ye û ya din jî ya Helbestvan Hemzeyê Meksî ye û name jî Ya Pr. Qenatê Kurdo ye.

Ev kovar, ta niha nehatiye dîtin û neketiye destê me. Li ser

vê kovarê, nivîskar Konê Reş weha dibêje: ((*Ne min û ne hevçerxên wî (Hesen Hşyarî) ev kovar dîtine*)).

• Kovarên Tevera Kurdî Li Sûriyê:

1. **Gulîstan:** Di sala 1968an de, Endamê Komîta navendî ya partiya Demokrat a Kurd (baskê H. Derwêş), Helbestvanê bi navûdeng Cegerxwîn, kovarek bi navê “**Gulîstan**” derdixist. Gulistanê weha xwe dida nasîn, ((**Kovareke wêjeyî û çandî ye**)). Rûpelên Gulistanê bi pênûsên nivêskarên Kurd, bi taybetî yê Seydayê Cegerxwîn dihatin xemilandin. Piştî guçbarkirina Cegerxwîn ji welêt sala 1979an, rewşa Gulistanê qels dibû.

Kovara Gulistan, ta sala 1995an berdewam kir û li gorî biryara komîta bilind ya Hevbanda Demokrat a Kurd li Sûriyê, ew û hersê xwişkên wê (Gelawêj, Stêr û Xunav) hatin seknandin. Di hundirê 27 salan de ji temenê Gulistanê, tenê 28 hejmar jê hatine weşandin. Ew jî, Salê Hejmarek û çend rûpelan dikin .


2-**Gelawêj:** Stêrkek din bi navê kovara **Gelawêj**, li sala 1979 an, ji hêla Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyê

(ElPartî) ve ji çapeminiya Kurd re li Sûriyê dibe diyarî. Ta sala 1982 an, neh hejmar jê diweşin. Di wê salê de, dubendî di nav ElPartî de çê dibe, Gelawêj jî dibe du Gelawêj. Yek di bin navê ElPartî de, û ra sala 1995an berdewam dike û wek me dabû xuyan, li gor biryara H.D.K ew jî radiweste, û ta hîngê hejmara Gelawêjê digihê 28an.

Li aliyê din, Partiya Kar jî berdewamiya derxistina Gelawêjê dike û ta sala 1988an deh hejmar (10-19) diweşîne. Hejmara 20–23an bi navê partiyên, Kar û Elpartî (basikê Isam'îl Umer) diweşe. Piştî ku di sala 1990–1992 an de, ew herdu rêxistin û parek ji Partiya Çeb, partiya Yekbûyî dadimezrînin, pênc hejmaran ji Gelawêjê bi durv û şewekî nû û bê navê tu partiyên li ser berga wê be diweşînin . Di sala 1993 an de, partiya Yekbûyî, partiya Pale û basikek ji partiya Hevgirtina Gel, yekîtiyekê lidardixin. Ji encama wê, partiya Yekîti ya Demokra a Kurd li Sûriyê tê damezrandin û kovara **Pirs** diweşînin.

3-Pirs: Ji encama yekîtiya di navbera (P. Yekbûyî, P. Pale û P. Hevgirtin) de ku li Nîsana 1992

an bû û partiya Yekîti ya Demokra a Kurd li Sûriyê (Yekîti) hat



lidarxistin, hejmara yekem, ji kovara Pirsê di Newroza 1993 an de ronî dît. Kovarê weha xwe da nasîn: **(Kovareke Rweşenbîrî serbixwe ye)**. Navê tu partiyên li ser sîngê wê tine ye. Ta nuha 40 hejmar ji vê kovarê weşîne. Wek tê xuyan ku, ev kovar - kême zêde – ya yekem e, ku demeke baş berdewam kiriye.

4-Stêr: Di buhara 1983an de, kovarek din bi navê Stêr di karwana çapeminiya Kurdî de li Sûriyê ronî dît. Ev kovar ji hêla Partiya Hevgirtina Gelî ya Kurd li Sûriyê de dihate derxistin, û bêyî ku navê ti partî li ser bergê be. Lê mixabin, piştî hejmara 20an, Hevgirtina Gel perçe dibe û kovar jî pêre dibe du kovar, Basikê Biçûk piştî hejmara 21an tevlî kovara Pirsê dibe, û basikê Piranî jî ta sala 1994an hejmara 24an derxist û di sala 1995an de , li gor biryara Hevbendî radiweste.

5-Xunav: Partiya Demokra a Kurd a Sûrî (Konfirans), di

sala 1986an de, kovarek bi zimanê zikmakî bi navê Xunav weşand . Navê partî li ser sîngê Kovarê aşkere bû. Ew jî, ta sala 1995an 19 hejmar jê tîn der û li gor biryara Hevbendiyê radiweste

6-Roj: Partiya Sosyalîst jî, wek partiyên din, li sala 1991an, dest bi weşandina kovareke bi navê Roj kir. Ev kovar ya yekem bû ku bîr û baweriyên ramiyarî tede cî digirtin. Ta sala 2001an (14) hejmar jê hatine weşandin.

7-Buhar: Di sala 1995an de, komîta bilind ya Hevbenda Demorat a Kurd li Sûriyê, biryara rawestandina van kovaran (Gulistan , Gelawêj, Stêr û Xunav) distîne û dest bi weşandina kovaereke nû bi navê **Buhar** dike. Hejmara yekem di 1995an de, ronî dît. Wek tê bîra min derdora 7 hejmaran jî vê kovarê weşî û ew jî rawestî.

8-Kovara Hevind: Li vê dawiyê, di bin siya partiya Yekîtî de, kovarek bi navê Hevind weşiya û ta nuha çar hejmar jê derketine.


- **Kovarên serbixwe**

Rewşenbîrên Kurd jî, hin Kovarên serbixwe weşandin.

1-Kovaran Gurzek Gul: Hejmara yekem, li sala 1989an û ya dawîn a 15an li sala 1992an derçû ye.

- **2-Zanîn:**

Hejmara yekem, li sala 1991an weşî û ya dawîn (12) li sala 1997 an derket.



- **3-Aso:**

Hejmara yekem, li sala 1992an weşî û ya dawîn (8) li sala 1998an derket.

4-Zevî: Hejmara yekem, di sala 2001 an de derket.

5-Roj: Hejmara yekê li sala 1991 an derket û hejmara dawîn (14) li 2001an derket.

6- Rojda: Hejmara yekê di sala 1997an de derket û hejmara dawîn (20) li sala 2002an derhat .

7-Jîn: Kovareke nîv Kurdî û nîv Erebî ye, hejmara dawîn (62) di sala 2002an de derket. Lê mixabin, ew jî zû radiweste.

- **Belavokên(Rojname)**

- **Tevgera Kurdî li Sûriyê:**

1. Dengê Kurd: Li gor agahiyên birêz Hemîd Hac Derwêş ku di pirtûka xwe ya bi

navê (**Ronahî li ser Tevgera Kurd li Sûriyê**) dide xuyan, hejmara duhem ji rojnama ya komîta navendî ya P.D.K, ji hêla wî û birêz Reşîd Hemo ve bi zimanê dê hat weşandin. Ev hejmar ji du rûpelan bêkhatibû û ew di destpêka sala 1960î de hatiye çapkirin. Û hejmara Heftan jî, di meha çirya paşîn li sala 1964an diweş. Hêjayî gotinêye ku, progirama siyasî ya partî jî bi zimanî zikmakî hatibû weşandin.

Li gor agahiyên ku birêz H. Derwêş di pirtûka xwe de diyar dike, di hundirê çar salan de, heft hejmar ji “Dengê Kurd” tên weşandin. Ango, mirov kane bêje, ku her heft mehan hejmarek derketiye .

Di vir de, pirsek girîng xwe davêje meydanê: Gelo, bi hebûna Osman Sebrî, Dr.N. Zaza û Cegerxwîn, di komîta navendî ya P.D.K de, çima partî rojnamek an kovarek bi zimanê zikmakî neweşandiye !?. Ev rewş, yanê tunebûna ti rojname û kovar bi zimanê dê, ji sala 1964an de, ta sala 1968an berdewam dike.

2.Belavoka Newroz: Li Gulana 1995 an, partiya Yekîti ya Demokrat a Kurd li Sûriyê

(Yekîti) li parêzgeha Helebê, gavek baş û pir hêja di pêvajoya rojnamegeriya Kurdî de avêt û mizgîniyek giranbuha da berketiyên zimanê zikmakî û dest bi weşandina rojnameyeke bi navê Neweroz kir.

Newroz rojnameyeke çandeyî û konevanî ye. Her du heyvan carekê dertê. Hejmara yekê di Gulana 1995 an de weşî, ew ji çar rûpelan pêk dihat. Piştî, rûpelên wê gihîştin 12an, û ta niha hejmara wê gihaye 78an. Hêjayî gotinê ye, ku ta hejmara 9an bi navê rêxistina partiya Yekîti ya parêzgeha Helebê weşî ye. Û ji hejmara 10an û pê ve, bûye rojnameya navendî ya P.Yekîti û durîşmên Yekîti li ser sîngê xwe datîne.

2. Deng: Rojnama Deng, rojnameyeke mehane ye, ji hêla P.Hevgirtina Gelî ya Kurd ve tête weşandin. Hejmara yekem di



Tebaxa 1995an de hat weşandin. Waşana wê niha ji hêla P.**Azadî** de tê weşandin û herjmara wê gihaye 90.


• **Belavokên Serbixwe**

1.Belavoka Perwan: Di Êlûna 2001 an de, ji hêla Komela Ciwanên Kurd ve, belavoka Perwan, hejmara yekê ronî dît. Ev belavok ji du beşan pêk tê, beşek bi zimanê Kurdî û yê din bi zimanê Erebî ye. Û ta niha hejmarên wê gihane 20an.

2.Belavoka Siba: Weşaneke çandeyî û nûçeyî ye serbixwe ye. Ji hêla xwendekarên zanîngeha Helebê, bi alîkarîra xwendekarên zanîngeha Şam û Laziqiyê dertê. Ev belavok, ji du beşan pêk tê, beşek bi zimanê Kurdî û yê din jî bi zimanê Erebî ye. Û ta nuha 14 hejmar hatine weşandin.

çavkanî:

- 1- Raperîna çanda kurdî di kovara Hawarî de. Dr Husên Hebeş. Çapa yekem, sal 1996. Belavgeha Hogir, Bon.
- 2- Hawar hejmar 1-9 wergerandina mamoste Mihemed Bekir. Weşanxana Hawar, Siwêd.
- 3- Kovara Nivîs, Hejmar 19, Nivîsara Kamîran Bêkes .
- 4- Pirtûka mamoste H.Derwêş, Ronahî li ser tevgera Kurd li Sûriyê.
- 5- Rewşa rojnamevaniya Kurdên binxetê, Gotara Konê Reş.



Ziman li navça Efrînê

Dr.Mihemed Elî

Hemî şênîyê navça Efrînê zimanê Kurdî zanin û pê deng dikin, Hrûniştvanên navçê yên Ereb jî, ji bilî şênîyê gundên ('Inabkê, Mêremînê û Şewarxa - du gund in), zimanê Kurdî zanin û pê deng jî dikin.

Zarê Kurdî yê ku li navça Efrînê tê xeftandin Kurmancî ye. Lê rengêkî Kurmancî yî taybet li Efrînê heye û ew bi şêweyekî hinekî naskirî û cuda tê bilêvkin. Ji ber wê jî, gava Efrînê deng kin, eger li binê dinê bin jî tî naskirin.

Dengkirina şênîyê Efrînê pir bi lez e, ta ji wan tê bêjeyan diguvêşin, ji ber wê jî ew kurt û têkilhevkirî derdkev û carna hin tîp jî jê tê xwarin.

Kurmanciya beşê Başûr ji navça Efrînê, xwe di şêweya bilêvkinê de berve Erebî badide, û gelek şorên Erebî têde bikartên. Lê li deverên Bakur, nemaze li deverên Dêrsiwan û hoza Biya, ew berve Tirkî diçe û gelek bêjeyên Tirkî têde hene.

Di çarçewa zarê Kurmanciya Çi.Kurmênc bixwe de jî, hinek cudatî di navbera hin dever û gundan de hene, wek şêweyê bilêvkinê hin şoran, hebûna şorên taybet, cudatiya rengên daçek “**Jî**”, hin cinav, veguastina hin lêkeran... û hwd.

Li deverên Bakurî li ser sînorê Tirkîyê, li deverên hozên Şêxan, Biyan û Amkan, mîna zarê Soranî, daçeka “**Jî**” bi “**Li**” diguherin. Dengkirina şênîyê wan, berve bilêvkinê Tirkî dere û gelek şorên Tirkî tê de hene. Ew yek jî ji dema dewleta Osmanî de maye.

Şênîyê devera hoza **Amka**: bi zimanekî sert deng dikin, li ser dawiya hin gotinan radiwestin û wê diguvêşin. Mînaka balkêş ji dengkirina Amkiyan re, dengkirina hunermend Mihemedê Elî Tico ji gu.Qirigolê ya Amkî ye. Bitevahî, dengkirina wan xort û şêrîn e, û bi tevahî cinavê peyvdar “**Î**” û yê nediyar “**E**” li dawiya şorê dikin “**Ê**”.

Mînak: **Tu dixwazî**, dibêjin: **Tu dixwazê**. **Ew dixwaze** dibe **Ew dixwazê**. Lêkera bûnê **BÛ** jî bi şeweya **BÎ** bilêv dikin. Û lêkera **HATIN** bi şeweya kevnar vediguhêzin û dibêjin **DITÊ**, li şûna şeweya wê ya niha pir bikar tê "**TÊ**". Cinavê destnîşankirinê **WIN** jî bi şeweya **HÛN** dibêjin. Em kanin van têbînan li ser seranserî deverên çiyayî belav bikin. Li bervajî wan, şeniyê deverên Başûr yên deştî, ku cinavên peyvok û nîşankirinê bi şeweya wê yê rast dihêlin, û lêkera bûnê û bilêvkirina wê jî rast dibêjin.

Gundê **Be'dîna** û yên derdora wê yên Şêxî jî, tîpa dengdêr "**Û**" bi dengdêra "**I**" diguhêrin û wilo, ji berdêla ku bêjin: **Dikuxwe**, dibêjin **Dikixe/dikixê**, û **Gind** ji dêvla **Gund**...û hwd.

Piraniya **Êzdiyan** jî:

Cinavê xwemalîn "**Ê**" wek "**E**" bilêv dikin, wek mînak, ji berdêla: **Ê te ye**, dibêjin **E te ye**. Û raweya: **TU DÊ/TUYÊ WERÎ**, ya ku Efrînî dikin **TÊ WERÎ**, Êzdî wê wiha bilêv dikin: **TE WERÎ/werê**, ev tişt li gundên Şikaka û bitaybetî yên ku hîn Êzdî mane, wek Bafîlûnê, Qestelê,... rind xuyan dibe. Di rewşa tewandina bêjeyan de jî, hin caran ji rêzikên rêzimên bider dikevin. Wek mînak, ew navê nêrza yê yekejimar, ji dêvla tîpa "**Ê**" bi tîpa "**E**" ditewînin. Mîna, ji berdêla bêjin: **Ew bavê te ye**, dibêjin: **Ew bavê te ye**.

Li gundên deverên Başûrî li deşta **Cûmê** jî:

Bi şeweyekî tevahî, em kanin bêjin, ku rêzikên rêzimên hatine parastin, lê belê gelek bêjeyên Erebi ketine nav Kurmanciya wan, û bi taybetî li ba nîfşê nûhatî.

Kurdên devera **Robariya** jî:

Şeweyeke wan e naskirî di dengkirinê de heye. Ew tîpa dengdêr a dawiya şorê dirêj dikin, û wilo şor tevde dirêj dibe. Ew şorên xwe ji kûraniya gewriya xwe de derdixin, û tu dibêjî belkî gewriya wan bi tişteki hatiye guvaştin. Şoreke Robariyan a taybet jî heye, ew jî **KE ye**, bi tîpa "**K**" ya nerm tê bilêvkirin. Ew ji bo gelek wateyan tê xebandin, lê ya sereke, wê ji raweya pirsyariyê re bikar tînin, wek: **Ke tê herî?**. **Ke tê werî?**. Yeka Robariyan a din jî heye, ew gelek caran tîpa "**X**" bi ya "**H**" diguhêrin û dibêjin: **DIKUÛÊ** ji dêvla:

DIKUXÊ, ew yek di dengkirinê rind xuyan dibe. Û bi vî rengî, gava merovê Robarî hevokeke tenê bêje, tavi lê Robartiya wî tê naskirin.

Li çiyayê **Şêrewa** jî:

Şêniyê Şêrewa gelek bêjeyên Kurdî yên kevin û resen di dengkirina xwe de bikar tînin. Şorên Erebi û Tirkî di dengkirina wan de pir hindik in. Dengkirina şêniyê Şêrewa naskirî ye, ew lêvên xwe hinekî zêde vedikin û kata tîpa dengdêr “A” piçekî kin dikin, bi wî rengî bilêvkirina wê tîpê dikeve navbera van herdu tîpan “A” û “E”. Şêniyê gundên Şêrewa û gundên Cûmê yên di ber çiyayê Lêlûn re, wek: Basûtê, Bircê, Kurzêla Cûmê, Xezîwê, Şadêrê jî... cinavê destnîşankirinê: **EV**, wek: **EVENE** bilêv dikin. Û digel ku Şêrewî ji Başûr û Rojhilat ve digihên Ereban, lê wan zimanê xwe yê Kurmancî baş parastîye, û pir hindik bêjeyên Erebi bikar tînin. Hinek bêjeyên şêniyê Şêrewa yên taybet jî hene, wek: Birako(keko), 'Ecî (kurikê biçûk), Nîvre (firavîn).

Tewandin: Em kanin bêjin, ku Kurmancên Efrînê bizelalî rêzana tewandina bêjeyan di dengkirinê xwe de bicih tînin. Şêniyê deverên Çiyayî hîn bêtir pêde derin û hin caran du tîpan di bêjeyekê de ditewînin, mîna gava ku navê **Henan**, tê tewandin dibe: **Henên**, lê hinek ji wan dibêjin **Hênên** jî, **Menan- Menên- Mênên**... û hwd.

Praniya Kurmancên deverên Cûmê û Şêrewa, li şûna nîşandeka veqetandeka navê nêrza yê yekejimar “Ê”, “Î” bikar tînin, wek: **Bavî te**, ji dêvla: **Bavê te**.

Rengekî dengkirina **Kirîf û Şêxemokan** ya naskirî jî heye pê tîna nasîn. Şêxemok mîna Kurdên Zaza tîpa “Z” ji berdêla “J” bikar tînin.

Ez dibînim, dengkirina herî xweşik li çiyayê Kurmênc ya şêniyê gu.Basûtê ye, bilêvkirina wan sivik, tenik û sade ye, belkî ji ber ku ew di dengkirina xwe de tîpa “R” ya nerm zêde bikar tînin. Û belkî jî, ji ber ku ew sûtê ji van du kirdeyan werdigrin, yek: Ew mîna şêniyê deşta Cûmê rêzikên rêzimên baş dixebitînin, ya din jî: Şorên resen ên şêniyê Şêrewa bikar tînin.....

CEGERXWÎN

(FESTÎVALA HEWLÊRÊ)

Di rojên 10-12/2/2008 festîvaleke/mehreçanek mezin li şarê Hewlêrê pêk hat. Ev çalakiya herî mezin bû, ku bi navê helbestvanekî Kurd hate lidarxistin. Xwedanê festîvalê wezaretê rewşenbîrî bû, komîta rêveberî û amadekirinê çalakdar bû û mêvanên wê ji Kurdên hemî cih û warî bûn.


Piştî ku wezaretê rewşenbîrî, bi serdariya birêz Felekeddîn Kakeyî, biryara lidarxistina festîvaleke bi navê Cegerxwîn da, komîteke bo birêvebirina kar û barên wê hate binavkirin, da xebata xwe bike.

Xebata komîta festîvalê:

Piştî ku komîte, bi biryara wezîrê rewşenbîriyê hate binavkirin, kar û xebat jî ketin çerxa xwe de. Wilo, vexwendiyên festîvalê, ji herçar goşeyên cîhanê, hatin binavkirin û rojên çalakiyan jî hatin diyarkirin. Ji her mêvanekî hate xwestin, ku xebata xwe li ser berhemên seyda Cegerxwîn

pêşkêşî komîte bike, da bikevin ber pîvanê û yên pejirandî ji wan

destnîşan bibin, û yên serkeftî cihê xwe di programê de bibînin. Ne tenha wilo, lê komîte belavokek li ser jînenîgariya seyda Cegerxwîn û berhemên wî çap û belav kir, da bibe pirtûka danasînê û herweha programa çalakiyên hersê rojên festîvalê, nivîsandî, berdest kirin.



Dervî van karên rêveberî, komîte bi karên organîzekirinê jî, bi hevkarîya wezaretê rewşenbîrî, rabû û hem pêşewaziya mêvanan kir, hem jî ew bi cih û qonax kirin. Bilî vê yekê pêşangeha kirt û mirtên seyda Cegerxwîn amade kir û jêmayên seyda tê de bi cih kirin. Ji cil û bergan, belgename, destnivîs, mohir û alavên karên torevanî û gelek tiştên din.

Ev çalakiya gewre û giring di bin navê dîwana sisiyan, ya seyda Cegerxwîn de, hate destnîşankirin. Û wilo, bi tîpên mezin li gel wêneyê Cegerxwîn hatibû nivîsîn:

**Kî me ez?
Festîvala Şairê Mezin ê
Kurd CEGERXWÎN**

Roja pêşî 10.02.2008:

Piştî mêvan gihiştin hola çalakiyan, programê rojê kat 10 sipêdê dest pê kir. Wilo, festîval bi xulek rawestan ji bo giyanên nemirên Kurd û Kurdistanê, kete çerxa xwe de, da piştî festîval bi nav bibe. Destpêk jî bi xwendina firdikekê ji helbesta "Kî me ez? ", li gorî navlêkirina festîvalê hat. Hinga dor hate ser tîpa Duhokê ya mûzîkî, da bi saz û awazên xwe festîvalê bixemilîne. Vê tîpê, bi sazêkî şêrîn û rewan dest bi komêkê ji helbestên Cegerxwîn kir.

Piştî çalakiyên tîpa Duhokê ya mûzîkî, parêzgerê Hewlêrê hate pêşkêşkirin, da bixêrhatinê li mêvanên xwe bike. Li pey gotina parêzgerê Hewlêrê, name û birûskên vexwendiyên ku derfeta amadebûnê bi dest

nexistibûn, hatin xwendin. Ji wan :

- Birûska Osman Baydemir serokê şaredariya mezin ya Diyarbekirê.
- Biroska malbata nemir Qadî Mihemed.
- Birûska Nivîskarê navdar Yeşar Kemal.

Wilo jî, di her navbirekê de, hin birûsk dihatin xwendin.

Gotina sendîka Yekîtiya Nivîskarên Kurd ji hêla Dr. Izeddîn Mustefa Resûl ve hate xwendin. Dr.I.M.Resûl şahnaziya xwe anî zimên û got, ku di vê roja pîroz de, di roja vekirina festîvala Cegerxwîn de, Y.N.K. hatiye damezrandin.

Di vê rêvebirinê de, dor hate ser wezîrê rewşenbîriyê birêz Felekeddîn Kakeyî, da bixêrhatinê mêvanên wezaretê rewşenbîrî bike û serkeftinê ji kar û barên festîvalê hêvî bike. Êdî dorê dide birêz Fadil Samir, da gotina Yekîtiya Giştî ya Nivîskarên Îraqê pêşkêş bike. Piştî gotin dighe cîgirê wezaretê rewşenbîrî ya Îraqa Federal birêz Fewzî Atrûşî, da ew jî vê gavavêtinê pîroz bike û serkeftinê ji kar û xebatên

rewşenbîrî re, bi piştgirtineke xurt, hevî bike.

Wilo, danê sipêdê bi xwendina hin biroskan û xwendina hin helbestên vebijartî, ji dîwanên seyda Cegerxwîn, bi dawî hat.

Danê êvarî bi çalakiyên rewşenbîrî kete çerxa xwe de. Di vî danî de, beşdarî ji herçar parçên Kurdistanê pêk hat. Lêkolînên li ser berhemên Cegerxwîn, li gel dîtin û analîzekirina beşdaran, hatin pêşkêşkirin. Ji wan: Dr.Sadeddîn Mella, Dr. Fadil Omer, Rezoyê Osê. Wilo jî lêkolînerekî ji Kurdistana rojhilat û xwendevanekî ji zankoya Ankarê, ku magîstera xwe li ser berhemên Cegerxwîn amade dike beşdarî kirin.

Piştî xwendina berheman bû dema pirs, guftûgo û bersivan li ser naveroka wan. Wilo, roja pêşî bi dawî hat û bû çaxê lihevpirsîn û hevnasînê.

Roja navîn 11.02.2008:

Li roja didiwan ji çalakiyên festîvala Cegerxwîn, grûpekê ji rewşenbîrên Kurd berhemên xwe pêşkêş kirin, ji wan:

- Dr.Kamîran Berwarî /Hizr û boçûnên netewî li ba Cegerxwîn/.
- Selwa Gulî /Jin di helbestên Cegerxwîn de/.
- Konê Reş /Hin helbestên min li ser Cegerxwîn/.
- Şewket Sindî /Çi hişt seyda bibe Cegerxwîn/.
- Mihemed Hemo /Heft şîretên Cegerxwîn/.
- Perwîz Cîhanî /Evîna yar û war di helbestên Cegerxwîn de/.

Piştî raxistina van berheman, dîse pirs, guftûgo û bersivan rola xwe di demê de sitandin û rûniştin têr kirin û xemilandin.

Danê êvarî taybetmendiyeke xwe hebû. Ew jî ne li bala kesekî bû, ku ji nişka ve serok Mesûd Barzanî derbas holê bû. Bi derbasbûna wî re herkes rabû ser piyan û bi çepikan bixêrhatina wî kirin. Wilo jî, li dawiyê, ew ber bi oxir kirin. Lê çalakiyên beşdaran bi hatina serok ranewestiyên û normal di çerxa xwe de geran.Xwedan berhem ev bûn:

- Elî Şemdîn /Qîr û halanên Cegerxwîn/.

- Nozad E.Bamernî /Taybetmendiyên Cegerxwîn di berhemên wî de/.
- Wezîrî rewşenbîrî birêz Felekeddîn Kakeyî ev festîval, di gotina xwe de wisa da pesindan, û got: "... Ev festîval serkewtin e bo herêmi Kurdistan û serkewtin e bo netewî Kurd..../.
- Ehmedê Hîto /Bi zargotinekê dest bi axaftina xwe kir û got: " Min got, te got, Golikê çêlek dot"/.
- Arjen Arî /Cegerxwîn Kurmancî û Soranî/. Wilo, helbestvanê navdar Arjen Arî ev dan bi nivîsa xwe bi dawî anî.

Roja dawîn 12.02.2008:

Di vê rojê de du çalakiyên mezin û balkêş hatin pêşkêşkirin. Yek ji wan tîpa balêtê ya Slêmaniyê pê rabû. Ew jî skêçeke balêtî bû, şêwe pêlane bû, di rengê asîmanê hişîn de bû û deryake bê binî û bê kenar bû. Ev balê bi navê Helebçe bû, ku pêlên ademîzadan rê nedidan hev û di ser hev re bê westan diqulipîn. Ji kartêkirina banbilind û pisporî temaşevan tev rabûn ser piyan û bi çepikên

germ ev tîpa hêja ,li ser vî karê serkeftî pîroz kirin.

Piştî van çepelêdanên gur û germ û piştî sipasiya komîta rêvebiriya festîvalê, filmekî dokumental li ser seyda Cegerxwîn hate pêşkêşkirin. Têde gelek movikên jiyana seyda hatin berçavkirin.

Fîlim bi pêşwaziya gelê Qamişlo ji gewdê seyda re û bicihkirina wî dest pê kir, da êdî qûnax bi qûnax li şopên seyda bigere. Ji serxetê, ji Binxetê, ji Ewropa û penaberiyê tanî bi hevpeyvînên bi dost û hendemên wî re. Piştî temaşekirina filim, rê ji nirxandinan re hate vekirin, da kesê bixwaze behweriyên xwe derbarî vî karê hunerî bîne zimên. Wilo, hersê rojên festîvalê bi dawî hatin, da çalakiyên seredan, ger , seyran û xatirxwestinan bi rola xwe rabin.

Belê, bi lidarxistina vê festîvala seyda Cegerxwîn, li ser asta Kurdistanê, zindî bû. Dimîne, ku senterek bo torevaniya Kurdî bête avkirin, da hemî torevanên Kurd cihê xwe tê de bibînin û bibe binekova lêkolînên tore û çanda Kurdî.

Rezoyê Osê

Belê... Cegerxwîn, ne tenê helbestvan bû, ew civaknas bû jî. Vaye Helbesteke vebjartî ji helbestên Cegerxwînê civaknas, ji dîwana wî ya heştan:

ÇÛNA NAV MALAN

(Dema di gel jina xwe diçin nav malan)

*Gava diçin cem malekê
Yan jî diçin sersalekê
Jinê bidin pêş xwe bira
Dibe tu bêjî min: Çima?
Ezê bibêjim Dê ye jin
Sûnda me herdem pê ye jin
Navê wê nîvê navê Xwedê
Xwedê du nav in: Xo û Dê
Ew dê ye hem paya te ye
Xuşka te ye, daya te ye
Dema gihane ber derî
Hiş kom bike di nav serî
Zengil bikut, raweste xweş
Ta kareva bû ron û geş
Ko yek ji hundur hate der
Dergeh vekir, xweş lê binêr
Ger ew jin e, bêj: Şev bixêr
Padîşaha gerden bi zêr !
Ger mêr e bêj: Şeva te xweş
Peşê bide pey wan bimeş
Dema ku çûn win serfiraz
Jinê bide pêş xwe bi naz
Hev nas nekin, şerm nîne ev
Xwe bidne naskirin bi hev
Pêşî bigire destê jina
Lê ser ji wan re dabine*

*Bêje şeva we xweş, şîrîn
Pesnê rewşa malê bide
Rûgeş bibe di ber xwe de
Jina te jî destan bidî
Nebî bikî şerm û fedî
Ji malxo re bit rû bi geş
Bijî keko şeva we xweş
Serbest bila rûnî li cem
Şeker brêjî dem bi dem
Mekêşe tim ah û keser
Rûgeş bibe rengê fener
Gazî meke ji xwe tu car
Zêde meke pesnê neyar
Dûrî xwe bik: Qerf û tinaz
Qet xwe mebîne payedar
Rû geş bike rengê bihar
Gava ji wan xatir we xwest
Ser xwer bike, bigre bi dest
Şêrîn bide pêş xwe bira
Ronî bidî rengê çira
Dema ku win çûn hundurû
Dilxweş bibe çendan di rû
Pesnê jina mêrik mede
Bizane ev der sersede



**MEMÛZÎNA Ehmedê
Xanî**

(4/4)

Rizgar Kurdaxî



• **Taybetmendiye serkêşan**

Xanî xwastibû ku li ser serdaran ango: Serok û rêberan jî binivîse, biqîre û wan bi xwîneran bide nasîn, belkî, xwazî û kêşka serokên paşroja Xanî van gotinan bixwandana...

Ew dibêje, ku serdar di hunavên xwe de, agir veşartine Ango: Mirovan disotînin ne neyaran!? Na xwe, gelê xwe û milletê xwe disotînin, her yek ku guh nede wan û bi ya wan neke, divêt bête kuştin, an jî biçe temenê xwe di zîndaneke tarî de birizîne.

Xanî dibê bi wan qet mekin bawer, xwazî ew serok birak an bavê te be jî, tu xwe ji jehra wan biparêze.

Ew ji koma mara ne, xwadî zihêr û jehir in:

Em qimê mîr qimê aş in

Bi fetil, ger, pêş û paş in

Waha jî diqîre, dinale û dibêje:

Hakim bi batin û bi zahir

Bê şubhe muşabihin bi agir

Zahir bi sîpahî û bi nûr in

Batin ji mudareyî dûr in

Rehmê ku dikin ji rengî roj in

Qehrê ku dikin cîhansoj in

Zinhar bi wan nekî tu bawer

Ger bav û pisî û ger berdar

Xasma ku muqerebî bedxwe

Nêzîk bibin ne'ûzu bileh

Hukam ji cinsê şahmar in

Eshab simûm û mihirdar in

Mihran ku didin bizan ku jehr e

Mehrê ku dikin bizan ku qehir e

Xanî dixwaze xiyanet û nedîtina rêber û serokan li ser peyman û sozên xwe li ser zimanê Memê, zar daxive dil, yanê çawa ku

Mem daxive dilê xwe, Xanî jî weha daxive gelê Kurd û dixwaze li ser qerarekê werin dîtin û bi yek bin:

Kanî qewl, qerar, soz û peywend	peyman û qesem yemîn û Sunda
Te digo ko di gel te sadiqim ez	Te digo bi te re miwafiq im
Te digo ko di gel te yek dil im ez	Te digo ko xudan tehemul im ez
Heyfa ko zêde bê wefa yî	welih ko ne qabilî cefa yî
Qelbî dexilî bê dilniyaz î	Pirçîl çep xerab û xar î
Herçend Xelîl î ey belakêş	Gulzar li te dibêtine atêş
Teşbîh te sed Hezar Bilbil	Sed car bikin vixan û xilxil
Perwan sîfet, li pêş werdan	Herdem disojim bi dax û derdan
Ey dil te xwe daye ber hewayê	Qesda te ew e bikî sefayê

Dexilî = Pirçîlî, xayînî.

Xaniyê me berê xwe dide asoyê û li ser bêdilovaniya jorîn weha ji me re bi zimanê Zîna lêv hunguvî diqîre:

Bilindiyê ji xwe re dixwazêt Sufliyê jî ji me re dixwazêt

Mirovan hildide banî paşê jî wî têwdike serzemînê, hertim dixwaze ku ew tenê bilind be û em hemî jê re kole û bindest bin. Ev taybetmendiya hemû kesên ku ezîtiya qirêj diparêzin, e.

Ango: li ser ezîperestan dinale, ew ezîperestên ku ta roja îro em ji dest wan dinalin, ewên ku bûne sedema perçebûna gel!?

Ev e nexwaşiya me. Ev e sedema şerpezekirina me.

Erê xwînerno ev e pirsgirêka bingeşîn, ger em îro xwe ji va ezîtiya jorîn rizgar bikin, emê siba bi yek bin, du siba emê rizgar bibin !?

Binêrin di va malika jêrîn de, Xanî çiqas bi nermî wan kesan ji me re tazî dike, dizane ku derd û nexwaşiya wan ezîtî û xwehezî ye, Xanî dibêje ew nexwaşên kîna dilî xwe ne, di xwîna wan de jehra ezeziyê dixuşe !?

Derdî xwe ji me re bêje jehra dilî xwe birêje

Ezê van malkên jêrîn ji yên Xanî jî diyarî xwînerên xwe bikim..

Mehra felekê ji ezel de edîme	kîna felekê ebed qedîm e
Herçî we go ji erdê raket	elbete ewî di erdê daket
Bilindiyê ji xwe ra dixawzêt	sufliyê ji me re nîhan dixwazêt
Nabînî her ko avtabî	davête mixareta turabî
Xasima ko digel qebîlî aşiqan	him xayîn, xar û him minafêq
Elbite dilî me aşiqî bazan	ewel dibêtin bi xenc û nazan
Axir dikêtin melûl û meyûs	wekî Memê zelifî mehbos
Davête mehbesê bênakam	datîne merqedê bêserencam
Herlehze digo çerxî dewar	eyî zalimê bê eman û xwînxwar
Min qesid û xered digel te nîne	aya te digel min ev çi kîne?
Dewrek te nekir demek ji bo min	pir dî te Memek ji bo min
Nûrek di riwê min kir te peyda	sohtin li Memê te pê sewda
Şewqek di roxê Memê te hilkir	qelbî min bi wê te sohit û kul kir
Ew te weha li min eyan kir	paşê te çira li min hinda kir
Sohtin te em bi agirî fîraqî	kuştin em bi derdî îştiaqî

• **Xaniyê bêhêvî**

Carna di şevên reş de, Zînê Mûm /Şem'e ji xwe re dikir demsaz lê mêze dikir, çawa ku ew weke keçên Kurdan ji dest evîna xwe disotin û nikarin wê ji dilê xwe ji ber sedemine curecur biderxînin

Lê Zîna min dizane ku mûm tenê fitîl disojêt û tenê dipişife û ew ango: Zîna çavbihuşî tevda û şevûrojan de, hertim bi ser hev de, disote, diqele û dipişife û dibêje:

Dem şeme dikir demsaz digotê:	Eyî hemser hemnoşîn û hemraz
Herçend bisohtin wekî min î	lê ne bi gotin wekî min
Derdê min û te ji yek biferqe	Ew ferq ji xerib ta bi şerq e
Meşriq tu yî agirê te zahir	Mexrib ez û batinê min agir
Tim disojêt min rişteyî can	Te nasojêt xêrî ew ziman
Agir li ser serî min û pêt di dil	Canê min di gel pêt bi ceng e
Herçend bi şev dimînî pêdar	Sibehan dinivî ta bi êvar
Êvar şev, roj û êvaran	Ez her disojim wisa li ser hev

Hemser: Hevalê xewê. Hemnoşîn: Hevalê gotobêjan.

Hemraz :Ê ku sirê mirovan vedişêre.

Bi nêrîna min, Xanî hêvî ji xwe re kiriye mûm, û bi zimanê Zînê daxiviyê, ji ber ku em jî dizanin Xanî di bêhêviyê de dijî. Dibêje mûm jî dipişife, ango hêvî jî anjiyan dibin, ji lewra dike HAWAR, HAWAR.

- **Şoreşgerîti di MEM Û ZÎNa Xanî de**

Xwînerên hêja û delal gava mirov navê Xanî dibihîse vêra jî destana wî ya pîroz Mem û Zîn weke çîrokeke evînî tête ber çavan. Çawa wan jev hez kirin, li kû hezkirina wan pêkhat, û çiqas binav û deng bû.

Hin dibêjin, ew çîrokeke evînî ye li ser zemînê pêkhat û tîrêjen xwe avêtine ezmanan.

Lê na delalno Xanî ne tenê li ser evînê nivîsî bû, herweha wî di ew pîrtûka pîroz de, li ser hemû êş û kulên Kurdan nivîsî bû.. Li ser nelihevkirina Kurdan, zulma li ser wan û.....

Di vê xelekê de ezê li ser gotinên wî ku li ser pêşmerg û nemirên Kurdistanê nivîsî bû rawestim...

Xanî dixwaze li ser nemirên Kurdistanê baxive û wan bi perwanan dide nasîn, û herweha çawa ku perwan ji êgir hez dikin li derdora wî difirin û giyana xwe diyarî wî dikin.

Pêşmergên Kurdistanê jî xwe davêjin nava ceng û şoreşan, xwîn, temen û canê xwe diyarî azadiya ciwan dikin.

Yanê Xanî êgir dike Azadî û şervanan jî dike perwan, ango: Pinpinîkên azadîxwaz û agirhez.

Gava mirov gulekê diyarî dostekî xwe dike, ew kêfxwaşîyekê peyda dike.

Lê gava mirovek brîndar bikeve çiqas ji ber dêşe û dinale...

Û eger mirovek ji mirovekî re fîdekar be, gelo çiqas ev binerix e, yanê ji canê mirovî buhatir tiştêk nîne. Ew jî wê diyarî min, te

wî û me dike, herweha diyarî azadiya Kurd û Kurdistanê dike..
Diyarî dayîka me hemiyana dike, vêca divê çiqas em hurmet û
rêzgirtinê ji wan qehremanan re bigrin!?

Di pîrtûka xwe ya pîroz û giranbûha de, daxive pêşmergan lê bi
zimanekî felsefî û li ser zimanê Zînê, çawa ew daxive pinpinîkan
û naxwaze ku ew zû bisotin .

Mîrê helbest û wêjevanan Xaniyê nemir, ne tim dixwaze li ser
evîna Mem û Zînê baxive, her weha di nava çîrokê de, carna
derbasî ax û axînên Kurda jî dibe, ew keda pêşmergên qehreman
jî qet û qet ji bîr nake û li ser ked, xebat û nemirtiya wan jî daxive
û hindekî ji wê mijarê dike nava çîroka Mem û Zînê, çawa ku
wan jev hez dikirin nemir, azadî û welat jî jev hez dikin û yarên
hev in.

Wî ji ber sedemine nediyar rasterast negotiye pêşmerg an
şervan, lê belê bi zimanê Zînê wa zimanê xwaş, şêrîn û hunguvî
ev aniye zimên, ango ji dêvla ku baxive pêşmergan, bi zimanî
xwe yî zêrînî dihêle ku zîn baxive perwanên êgir û ronîhez
(pêşmergên azadîhez) û weha dibêje wan pinpinîkên
giyanronahî, sembolê biharên rengîn ên ku NEWROZÊ di hinava
xwe de vedişêrin ta ku serma zivistanê wê nexwaş neke..

XANÎ waha dibêje pêşmergan:

Ey tairê aşiyana firqet	weyî bilbilê buxçeyî hurqet
Mêrane dibuxişî can erzan	Heyfa ku bi mirinzanî lerîzan
Nawestî demek li ber hewayê	Napuxte teleb dikî fenayê
Ew lez ji te re gelek qisûr e	Ew leriz ji te re futur e
Bêsebrî bêsikona û bêtab	lewra xwe dikî bizûyî pirtab
Nepuxteyî eyîbeke temame	Metbox dibêjin ku xam e
Puxte disojin mekir tu çaran	Fanî qet dibin bi nûr û naran
Wî cismî minewer melekî roh	Beyda qemera moqabeletî Yoh

Dibuxuşî: Didî, diyar dikî. Lerzîn: Cirifandin. Napuxteyî: Nezanî, xeşîm.
Pirtab: Pirger, pîrfîtilandin. Metbox: Zana. Xam: Xavî, nebuyî. Puxte:

Neyar, dijmin. Yoh: Navekî ji navên royê ye, hevpeyvîna navbera Memo û Zînê de, navbera şervanekî û agirê azadiyê (Şoreş). Perwan = Pêşmerg(Şoreşvane) Şeme = agirê azadiyê ye (Şoreş e).....

Gava we go per li wî sotin	wan çend gotin biyekve gotin
Perwanê go: Tu xwaş delîl î	Şemeyê go: Tu xwaş xelîl î
Perwanê go: Tu rehname yî	Şemeyê go: Tu canfîda yî
Perwanê go: Tu dîlfêroz î	Şemeyê go: Tu sînesoz î
Perwanê go: Tu çaresaz î	Şemeyê go: dilniwaz î
Perwanê go: Tu padîşah î	Şemeyê go: Tu qîblekah î
Perwanê go: Tu horî zat î	Şemeyê go: Tu norî zat î

Min xwaste ev malkên jêrîn bi ser ên Xaniyê nemir binivîsim.
Min ew diyarî roja rojnamegeriya Kurmancî kiribûn dema ku komeleyên ciwanên Kurd bi wê rojê pîroz derketi bûn seyranê...

<i>Perwanê go: Tu daxwazî</i>	<i>Şemeyê go: Tu hestbir î</i>
<i>Perwanê go: Tu cîgersoj î</i>	<i>Şemeyê go: Tu cîgersaz î</i>
<i>Perwanê go: Tu çav î</i>	<i>Şemeyê go: Tu çavsazî</i>
<i>Perwanê go: Tu ronahî yî</i>	<i>Şemeyê go: Tu avtab î</i>
<i>Perwanê go: Tu agirgeş î</i>	<i>Şemeyê go: Tu pêt î</i>
<i>Perwanê go: Tu NEWROZ î</i>	<i>Şemeyê go: Tu veroz î</i>
<i>Perwanê go: Tu war î</i>	<i>Şemeyê go: Tu yar î</i>

spas

Ilse Aichinger

Amedekirin û wergerandin:
Tengezarê Marîî

Ilse Aichinger û xwişka wê ya cûmik Helga Aichinger li Wien ji bavekî mamoste û dayikeke bijîjk di 1Novemberê sala 1921an de ji dayîk bûn û piştî bav û dayîka wê li 1926an hev berdan li ba dayika xwe li Wien maye.

di navbera salên 1938– 1945an de, dayika wê cihê xwe yê bijîjkiyê di dema desthilatdariya Naziyan de windakir, û gelek kes û xizmên wan hatin kuştin û ji ber ku ew cihû bû rê nedanê ko here Gemasiyomê.

Di 1953an de Ilse Aichinger bi Günter Eich re zewicî.

Li sala 1971ê Mêrê wê Günter Eich dimre, û li sala 1984an li Frankfurt am Main niştecih dibe.



Xelatên Ilse Aichinger:

Di navbera salên 1952an û 1995an de, Ilse Aichinger ev xelat wergirtin:

Xelata toreyê ya Gruppe 47. Xelata Immermann ya bajarê Düsseldorf. xelata toreyî ya bajarê Bremen. Xelata Nelly-Sachs. Xelata Petrarca. Xelata Franz-Kafka. Xelata Marie- Luise- Kaschnitz. xelata Europalia-Literatur ya EG. Xelata toreyê ya mezin ya Bayerischen Akademie ya ciwaniya hunerê. Ji bo berhema xwe Lebenswerk“ berhema jiyane“ xelata toreyî ya bilind ya welatê Nemsayê wergirt.

Berhemên Ilse Aichinger:

Ilse Aichinger li destpêkê dest bi xwendina bijîjkiyê kir, lê zû dev jê berda, ji ber ku wê di xwe der anî ko ew nivîskar e, û herwiha li Êlûna sala 1945an dest bi nivîsîna romana xwe ya yekem kir "Das vierte Tor = Dergeha 4an", ew jî li ser embargehên Naziyan bû, û cara yekem bû ko li Nemsayê li ser wilo babet dihate weşandin.

Li sala 1948an Romana wê ya bi navê "Die größere Hoffnung = Hêviya mezintir " hate weşandin. Li vir Ilse Aichinger behsa çarenûsa gêncekî dike, ko di dema nazîyan de bû. Ew rewşa di navbera xewn û rastiye de, bi şeweyekî nazik behs dike û di pey re êdî hew roman nivîsîn.

Li sala 1952an Pîrtûka çîrokên "Rede unter dem Galgen= axaftina di bin sêdaredanê de" hate weşandin. Pir li ser vê pirtûkê hat nivîsîn.

Li sala 1953an Pîrtûka çîrokên a bi navê "Der Gefesselte= yê Kelepçekirî" belav kir.

Li sala 1963an berhema xwe ya bi navê "Wo ich wohne = Ez li kû niştecih im"- berhemeke serpehatiyên xewnan e weşand.

Li sala 1965an Elîz Elîza weşand. Li sala 1969an Auckland weşand. Li sala 1976an Ilse Aichinger di kombenda "Schlechte Wörter= peyvên xerab" guherîna di şeweyê nivîsîna xwe de dike. Li sala 1978an Verschenkter Rat= Şîreta Diyarî-Helbest, û "Mein Sprache und Ich= Zimanê min û ez" komeleyek çîrok diweşîne.

1. Bersiva Zivistanê

Gerdûn e, ji qumêş,
dîtinê dixwaze
Çav nema hene
mêrgên spî bibîne,
guh nîn in,
dako li serên şaxan,
firfira balindeyan bike.
Dapîr, kanîn lêvên te,
ji bo çêjê ji geyê bibînim,
û mirovê me, bêhin bike,
hetanî asîman bi dawî were,
hinarkên rûyê xwe heya îro jî dipêrxîne
Hîn birîn , li ser dîwarên gund in?
Ma ne daristanek e tarî ye,
ya berê me ber pê ve bibû?
Na Dapîrê, ew netarî ye,
ez vê yekê dizanim,
demeke dirêj jiyabûm,

li nik zarokan, li kevîkan,
û ew ne daristan e jî.

2. Yekşemê berî nîvro

Ji xwedê hez bikin
Bo wî nimêj bikin
Û xizmeta wî bi tenê bikin
Vehesîn e
Li ser rêça berbi hewşan ve
Di demeke durust de.
Ji dûr ve dîtin,
di nêv berfê de.

3. Marianne

Tiştê min haş dike,
dema di şevên zêrîn de
zarokek binive.
Ku henasa wî di teniştê hesinxanê re diçe
Û hetava wî hîn zû
Di gel dîk û mirîşkan
Xwe di ser giyayê şil ve çe dike.

4. Derveyî welêt

pirtûk ji pirtûkxaneyên bêgane,
yên bi hêzkirina kevokan
eger hat li ser deveran
yên em, di wê rewşê de ne, ko jê bar dikin
digel dirîreşkên xwe
xweliyan,
ko di rakirdankê de xwe didin hev,
xwe bi hêminî di pey min re diguherênin,
lê em dimînin,
li ser piştên gerim
ên bexçeyan, keviran
an jî ji rijaleyê.

** Ev helbest ji pirtûka **Ilse Aichinger** ya bi navê *Verschenker Rat* =
*Şîreta Diyarî, hatine hilbijartin.**

Li ser sirtekê ji sirtên çiyayên Kurdistanê gundekî hevkar hebû, gundiyên wî pir ji hev hez dikirin, û tev wek malekê bûn û bêhna kevnariya dîrokê û merovatiyê ji wan dihat. Wî gundî jiyana xwe ya aborî bi xudîkirina pez û dewaran berdewam dikirin.

Kalemêrek li gund hebû, ji zaroktiya xwe de şivantî dikir û pezê gund diçêrand, û pir di şivantiya xwe de jîr û jêhatî bû. Ticarî Guran nikanîn berxek ji wî bidizîna, ne jî wî miyek wenda dikir. Her roj, berî ku pertavên rojê eniya çiyayê ramûsandana, hawehawa wî dihat û pezê gund li newalan digerand. Lê li seranserî jiyana xwe ya şivantiyê, wî zirarek bi zevî, baxçe û darên gundê xwe û

yên derdora xwe nekiri bû, ji ber wê jî, ew bi navê "Kalê Dilovan" hati bû naskirin.

Rojekê ji rojên dema berî biharê bedena rojê bilind bû, gundiyan pez û bizinên xwe berdane jêrî gund û li benda Kalê Dilovan bûn. Gundiyan bi hev re digotin, derengî ne ji karê Kalê Dilovan e, ne jî ti caran wilo dereng maye, wî ji bo çi îro wilo kiriye, kanî yek herin serdana wî bikin ta em binasin ew ji bo çi dereng maye. Lê mala felekê bişewite, û konê mirinê hilweşe, dema ku gundî çûn mala Kalê Dilovan, dîtin ku wî kurkê şivantiyê li xwe gerandiye, û bê şivûliv ketiye. Wan ew çeperast leqandin, lê mixabin ew bê can ketibû û çûbû dilovaniya Xwedê.

Kalê Dilovan bê zarok bû, pîreka wî jî berî çend salan çûbû ber dilovaniya Xwedê xwe. Lê ji ber qencyê wî yên zor bilind di dirêjahiya jiyana xwe de ji gundê xwe re, gundiyan jî ti kêmanî bi wî re ne dikirin, û wan teva xwe wek xwediyên wî didîtin, û ne di xweşiya wî de, ne jî di mirina wî de, wan ti kêmanî ji wî re nekirin.

Pêştî mirina Kalê Dilovan, gundî ji bo şivanekî ji pezê gund re bibînin, lihev rûniştin. Bavê Çeko got: Gelî gundiyan, kurê min Çeko bê kar e, ez dibêjim, bila ew şivantiya pezê gund bike. Gundiyan tevan ji wê pêşniyarê re erê kirin, lê yekî ji wan kesereke pir kûr kişand û di ber xwe de got: Eger Çeko kete şona Kalê Dilovan, em namînin xwedî pez, ez bawer im emê nema şîr vexwin.

Pêştî gundiyan erê kir ku Çeko bibe şivanê gund, roja din bi sibehê, Çeko ji xewê rabû, bi lezûbez çû pêşiya gund, keriyê pêz da pêşiya xwe û berê wî daye çiyê.

Li dema êvarê, pez vegeî, lê bizina mala Reşo ne pêre bû. Dema ku Reşo çû li bizina xwe gerî, ew li hestû û eyarê wê rast hat, ji ber ku guran bizin xwari bû.

Roja din Çeko pez bir deştê, lê li dema êvarê, gava ku pez vegeî malan, miyeke mala Fatê nehata bû, ew jî çûn lê gerîn, û dîtin ku Çeqel di ser de ne û wê dixwin.


Li roja sisiyan, Çeko pez bir newalan, lê dîsa li dema êvarê, dema ku pez vegeî gund, pênc berxên mala Remo tine bûn. Ew jî pir li wan geriyan lê nedîtin, xuya bû, ku dizan ew ber biribûn.

Roja carê, Çeko pez bir pişt gir, û kurk li xwe gerand û di

xew de çû, pez kete nav zeviyan û her çend dewar bi derekê de çûn. Çeko ji xewê rabû wî pezek nedît, ew çep çû rast vegeerî lê pez nedît, û ew berî rojava bê pez vegeerî gund, dema ku gundiyan pirsra pêz ji Çeko kirin, wî got: Bi xwedê ewran kire reqereq, cefil bi pêz ket û her yek bi aliyekî ve revîya, ez pir westiyam da wan kom bkim, lê min nikanî.

Gundî li çol û çiyar, û li gelî newalan belav bûn, li pêz geriyar, û ra dawiya şevê man, lê ew bê pez vegeerî.

Roja din bi sibehê, gundiyan ji nûve berê xwe dan çol û çiyar û li pêz geriyar, lê mala şivantiya Çeko bişewite, komên Guran bi nav keriyê pêz ketibûn, û pezek zindî nehîştî bûn. Û herwiha gundî bi xemgînî vegeeriyar, û ji wê rojê de, eger yekî ji gundiyan karê xwe baş nekira, bi wî re digotin, karê wî bûye "şivantiya Çeko!!". Û eger mirovek bêkêrbûya, digotine bûye Çekoyê Şivan. Û eger malbetek bê rêber ba, digotin ew malbeta wek pezê Çeko ye, û kîjan rojê be ewê bi nav lepên Guran keve.



Çawa Goltşo di diz derxist

Hebû nebû merovekî pir dewlemend û sermiyadar hebû, û kurekî wî hebû, piştî mirina wî hemî hebûn û sermiyana wî ji kurê wî re ma, lê ji ber ku wî nizanîbû ew hebûn bi çi tonî gîha bû hev û ti cefa di ber de ne dîtîbû, mixabin wî ew hemî hebûn di navbera çend salan de windakir û li mata reş ma, hema xwarina rojane jî tine bû ku ew bixwara, û ji ber ku nizanîbû tikaî jî bike, rabû dest bi civê û parsê kir, wî cilên xerxûte li xwe kirin, li gundan geriya û civ kir, lê ji ber ku ew mirovekî li ser xwe bû, û wek ku tê gotin nîrek di stûyê wî re ne diçû, gundiyan ew ji nav gund diqewitand û tu pere nedidanê, bi serde jî ew tektîr dikirin û jê re digotin, here karekî ji xwe re bibîne, bi xuhdana eniya xwe nanê xwe bixwe û ew ji pêş malên xwe diqewitandin, loma jî ew ji gundekî diçû gundekî, û nikari bû tiştêkî bi dest xwe xista.

Rojekê ji rojan ew ji gundekî diçû gundekî din, bi rê de rastî çemekî hat, û ji ber ku wî melevanî (avcenî) nizanî, newêrî di avê re derbas ba, ew virdewirde diçû û dihat, li delavekî digerrî ku tê re derbas be aliyê din, lê wî ti rêk nedîtî. Hîn ew di mujûliyê de bû û bi ser xwe de diramanî dê çawa di avê re derbas be, cotariyek gihîşte wir, û xûya bû, ku wî jî dixwast derbas aliyê avê yê din be û here gundê xwe. Ê cotarî dît ku ew li xwe heyiriyê, çavekî wî li çem e û yek li gundê ku li aliyê wî din e, û ew têgihîşt ku ew dixwaze di avê re derbas be lê newêre, dem jî li ber êvarê bû, royê xwe berdabû rojava, û perda tariyê hêdî hêdî dadiket. Dilê cotarî pê şewitî û li ber ket, jêre got: Xorto, vê çiqinê di destê xwe ke û mehêle di avê werbe û şil bibe, ezê jî te li kola xwe kim û derbas aliyê avê yê din kim, lê mehêle çiqin di avê wer be ha., xort li piştê kalê nûşt,

çiqin kir paşla xwe û bi vî awayî herdu di avê re derbas bûn. Dema ku gihîştin aliyê çem yê din, xort ji ser pişta cotarî peya bû, hema bi serê lêvan ew sipas kir û yekser berê xwe da gund û çû, lê cotarî deng lê kir û got: Xorto, xorto raweste, raweste, xûya ye ku te çiqina min bi xwe re ji bîr kiriye, ka çiqinê bide min û paşê here, hemî sermiyan û hebûn û nebûna min di wê çiqinê de ye, lê xortê gepir pehin hema nîv badayî xwe berve wî kir, bi awirên tûj lê nihêrî û got: Ew çi çiqine ku tu dibêjî û çi sermiyane! Bes ne ew çiqina ku min di sîngê de vaşartiye be, cotarî bi rûyekî nerm got: Ma ew ya kê ye, netê bîra te ku min ew da dest te daku di avê wernebe û şil nebe û min tu li pişta xwe kir û tu di avê re derbas kir, kurik got: Bi carekê te ti çiqin nedane min, çiqin çiqina min e, ez li neh herêman, gund bi gund di bin berf û baranê de, di germê de ez geriyame, min destê xwe dirêj kir û li ber gundiyan vergirt û pars kir taku min ev pere gihandin hev, tu jî tê ji min re dibêjî, ku ew pere yên te ne, ma tu ji xwedê natirsî!

Ji ber ku te ez li kola xwe kirim û di avê re derbas kirim, ji ber vê tu yê perên min jî ji min bibî!

Cotariyê reben dîsa gazî kir û li ber wî gerî, belkî dilê wî nerm bibe û perên wî lê vegeirîne, lê mixabin gazinên cotarî ti hikarî bi wî nekir û dilê wî nerm nekir, ji ber ku wî çavên xwe berdabûn pereyên cotarî yên zêrî û herwiha ew li wir ketin qirka hev. Yê xort xwe bi hêrs ji destên cotarî rizgar kir û bi dengê bilind lê kir qêrîn û got: Ji ber çavên min here cotriyê derewîn û dernexûn, ez ti peran nadim te, pere pereyên min in.

Bi dengê û qîrecira wan, gundî hatin li dor wan civîn û li wan temaşê kirin, hinek ji gundiyan ketin navbera wan û ew ji hev bi dûr xistin, welatiyan jî gazin ji yê cotarî kirin û gotin: Ma tu li berxwe nakevî û ji xwe fedînakî tu destên xwe dirêj perên vî xortî reben dikî, ma tu ji ber rihên xwe yên sipî ve fedî nake!

Cotariyê reben şêt û mêt ma, û ta ku kanibe gundiyan bighêne baweriyekê ku ew

pere yê wî ne û ne yê xortin, û wî destên xwe dirêj perên kesî nekirine û yê dest dirêj xorte ne ew e, nema dizanî çî bike, lê mixabin herku diçû yê xort dengê xwe bilind fikir û digot: Ew diz e, dernexûn e, pere yê min in, min ew quriş bi quriş gihandin hev ku wan ji royên reş re veşêrim û hilînim, û bi vî awayî her diçû baweriya gundiyan bi xort bêtir dibû û lome ji cotarî dikirin.

Hîn ew di wê qire çirê de bûn, mirovekî bi navê Goltşo, li piştta kerê xwe yê kulek û guh dirêj siwar bibû gihîşte ba wan, dema ku çavên wî li xortê gepir pehin û cotariyê reben û melûl ketin, ew ji kerê xwe peya bû, berve wan çû, kûr kûr li herdiwan nihêrî û guh da gotinên wan daku tê bigihê ka çî heye.

Piştî demekê ji qireçira xortê civînok û cotariyê reben û melûl, Goltşo gundî bê deng kirin û ji wan re got: Gundîno ji min bibhîsin ezê çî ji we re bêjim:

- Gava ku em guhê xwe didin van herdu mirovan, em kesî ji wan diz nabînin, herdu paqij in û wek ava zelal in.

Wê gavê hinekan ji gundiyan dengê xwe bilind kirin û gotin: Wilo çênabe, bê gûman yek ji wan dize, eger ne wilo ba, çima ketine qirka hev û li hevdixin.

- Goltşo got: Sibe dê bê û emê zanîbin kî diz e û kî ne diz e, emê bi alîkariya van herdu çovên avsûnkirî yê diz nas bikin, rinde jî ku ew herdu çov bi min re ne.

Goltşo ew herdu çov ji têra ku li ser piştta kerê bû biderxistin û şanî gundiyan kirin, daku wan bi çavên xwe bibînin, û ji wan re got:

- Ev herdu çov bi dirêjbûnê qasî hev in, her yek ji wan ê çovekî bi xwe re bibe û wî di bin balgiyê xwe ke, bi rojhilatê re çovê yê diz wê ji yê din dirêjtir bibe, bi vî awayî emê yê diz ji yê ne diz nas bikin.

Gundiyan tevan ji gotinê re erê kirin, û Goltşo her çovek da yekî û ew her yek xistin odakê û herkes vegeirî mala xwe.

Dema ku yê cotarî kete oda xwe cilên xwe ji xwe danîn û çovê xwe xiste bin balgiyê xwe û seriyê xwe danî û

raket, ji berku tu fût û pêlan di seriyê wî de tinebûn.

Lê yê xort, tiştê ku hati bû serê wî netê serê kesî din û kes nebîne. Ji êvarê de heya sibê, xew neket çavan, xwe virde û wirde badida, wek roviyekî bi ber feqê keve, ramanek dihat û yek diçû, li çarekê digeriya ku xwe ji vê pêkhatiyê rizgar bike, ka ewê çawa xwe ji çovê Goltşo yê avşinkirî xelas bike, ew li ber destê sibehê gihîste çareyekê, ew jî ev bû got: Ezê têra bostekê ji çov bibirim û nema çovê min ê ji yê wî dirêjtir bibe, bi vî rengî ewê diz derkeve û ne ez.

Sibehê zû hinek ji gundiyan hatin ew herdu bi çovan ve birin gastîna ku li nav gund bû, li wir Goltşo û gelek ji gundiyan li benda wan bûn, her yek ji wan dixwaze nas bike ka kî diz e. Goltşo berve yê cotarî çû çovê wî jê bir, û çovê xort jî jê bir, ew herdu çov dane berhev, yekser tê derxist ku xort diz e ne cotarî, û tiliya xwe berve wî kir û got:

- Gundîno diz eve, diz eve.

Wê hîngê qirûçir ket nav gundiyan û gotin: Çawa dibe ... Ma ne çovê wî ji yê din kintir e, ma ne te got: Ku çovê yê diz dê dirêj bibe, wilo nabe îcar te şaş kir ev yeka nabe .

Goltşo rûken bû û got: Gundîno kengî we bihîstiye ku darekî hişk dirêj bûyê, ticarî darê hişk dirêj nabe, ev jî rastiyeke e zanistî ye, ma win jî bi min re nabînin ku diz yê xort e û ne yê cotarî ye, wî kêr hişî ji min bawer kir ku çov wê rast dirêj bibe, loma wî bostek ji çovê xwe jêkir û bi vî rengî xwe xiste ber feqê.

Gundiyan li çavên hev nihêrîn û tev têgihîştin ku Goltşo hişmend û ramankarekî gewre ye, tev rabûn bi kolemistan û çovan bi ser xort ketin, ew bi lêdanê nîvmirî kirin, pere jê vegerandin û dan yê cotarî, û ji ber hişmendiya Goltşo û ramanên wî, ew jî helbijartin û kirin keyayê gund.

***Ji pirtûka (Sandîqa Textî), nivîskar: Ciyorcî Rosevov
Wergerandin ji zimanê Erebi: Mistefa henan**

MIN NIZANÎ ÇI BÛ !!

Ebdilmecît Şêxo

Min nizanî çî bû !!

Ji nişkava min dît

hemû gulên guldanên

hawîrdora min

serxweş,

çavbeloq bûn,

bi awirşewat bi stêrka Gelawêjê re

dipeyvîn.

Darên çavên keçên min

babelîskên tûj

di nav porên dilberan de

berdan.

Qîrîna zarokên di pêçekan de

mîna çivîkan di dilên

jinên bedew de

dilorandin.

Lê min nizanî çî bû !!

Min dît MELEKÎ TAWUS

û neqşa welatê "Diyako "

ya ku li ser avraza Hesîrkê

û li ser berpala çiyayê Lêlunê

bi hevringa Rîngoyê Kîmarê nîgarkirî

çkên hev ji fêrmêskên dîlzariyê

paqij dikirin.

Lê min nizanî çî bû!!.

Min dît

baweşînên darên zeytonê

henarên kerikî ji daran

bi ser serên bûk û zavên

bajarê min de berdidan.
 û keskesorê ji gulistana xwe
 nêrgiz bi ser alûleyên giyanên
 dayikan de berdidan.
 Lê dîsan min nizanî çî bû !!!
 Min dît îro
 karwanên tivîrk û hehecukên
 gundên me
 mîna berbiyan
 bi sêmfoniyên hestnazik
 pêşwaziya fireşteyekê
 dikin.
 Dîsan min nizanî çî bû!!
 Lê min dît helbestên
 Rûxwaş û Hêmen
 bi destanên bajarê min
 avdas dikin
 û xûşxûşa kaniya "Maratê."
 mîna minalekî
 di dawa Xedîca Sewrên de*
 bê mêtina memkan
 û li ber lorîna Leyle bi ara amî.
 xew dike.....

Almaniya 1.09.2007.

*Xedîca Sewrên: Dayika hevalê min, têkoşerê dilsoz Edîb Îbrahîm, li roja 18.08.2007an li Almaniya bû qurbana welatê xwe.

DAWIYA XWÎNVEXWARAN

Merwan Berkat

*Bixwîna perîşanan
Eniya xwe,
Dixemlandin .
Ji kuzûra estiyên şewitî
Çavên xwe kildidan
Dijî jînê bûn
Hovên sedê bîstan bûn
Sexteperest bûn
Bi zor û zordariyê ...
Bi kuştin û lêdanê ...
Bi tarûmarkirinê ...
Bi gunekarî û hovîtiyê
Nasnama dîroka xwe,
Dinivîsîn.
Ne Nîron ...
Ne Holako ...
Nejî Diqilyanos
Ne wek wan bûn
Na .. ne wek wan bûn.
Di mejiyê wan de
Ramanên kuştinê
Hatibûn çandin
Bi kuştina zarokan ..
Ya kal û pîran ...
Jin û mendalan
Rojên xwe ,
Bi nav dikirin .
Bi nîşanên gunekariyê
Sîngên xwe ,
Dixemilandin .
Gawirtiyê serê xwe,
Li ber wan ditewand*

*Her dev û diranên wan
Bi gilîza hovîtiyê
Lewitî bûn
Nimêjvanê sexteperestiyê bûn .
Qelazên bêsiinciyê
Di stûyê wan de bûn
Her jê vedixwarin
Lê ew têr nedibûn .
Li ser sergûhên qirêjîyê
Xwe vedigevzandin
Jehra jînê bûn
Golmên şîrê ter
Di gewriya şîrmijan de ,
Dimeyandin .
Dilê Ciwanan diqelaştin
Evîn dikuştin
Bê sedem û sûc ...
Bûk bi dar dixstin
Û bi zindî
Zave binax dikirin .
Ew dijminên ...
Kesk û sipî bûn
Dijminên gul û gulistanan bûn
Dijminên çem û kaniyan bûn
Dijminên dar û beran bûn
Ew dijminê siruştê bûn
Daristan dişewitandin
Bilbil û çûk
Kew û kevok
Hehecîk û şalûl
Ta pinpinîk û tivîrk
Sirgûn dikirin*

Bîna solên Ejdehak
 Xweşiya canê wan bû
 Ne meyvexwarbûn
 Na na,
 Ne meyvexwar bûn
 Ew xwînvexwar bûn
 Her hevalê tariyê bûn
 Dijî îşq û ronahiyê bûn
 Pirtûk
 Rojname
 Lîstok û kovarên zarokan ,
 Tev dişewitandin
 Li ser dîwarên ...
 Mizgeft û zanîngehan
 Gur û kuftar
 Mar û dûpişk
 Tabût û goristanan
 Wêne dikirin .
 Li ser dîwarên dibistanan
 Mirovên serî jêkirî
 Jinên bê çav û bê pî
 Zarokên bê guh
 Û bi niv serî wêne dikirin .
 Li ser deriyên malan
 Çêrokên mirinê dinivîsandin
 Li ber sîmfoniya nalenala
 birîndaran ,
 Sema dikirin
 Her ku bîna kefecanê
 Dihate wan
 Hovîtî di wan de
 Gur dibû.
 Zingara sedê bîstan
 Kela xwe ,
 Di ser rûyên wan de rijan dibû

Hêêêêê hê felek
 Hêêêêê hê gerdûn
 Li dawîya her tariyekê
 Ronahî heye
 Li dawîya şevê
 Roj heye
 Di dadmendiya xwedê de ,
 Maf namire
 Wenda nabe
 Û her kesekî
 Li cihê wî vedigerîne .
 Şêr û piling ...
 Şîp û leheng
 Li çîyan vedigerin .
 Çeqel û rûvî
 Xwe di qulan de vedişêrin .
 Belê
 Her darek berê xwe digre
 Û her gulek di cihê xwe de ,
 Geş dibe.
 Belê.....
 Di dadmendiya xwedê de ,
 Her eniyek
 Daxa laq dibîne
 Û her mirovek
 Li rastiya xwe vedigere ,
 Hin dibin serok
 Û hin jî
 Di dadîgehan de ,
 Riswa dibin .

18 . 4 . 2006

Pirtûkek Nû:

ÇIYAYÊ LÊLÛN DI NÎNIKA MERWAN BEREKAT DE

Dr. Rozad Elî

Li sala 2007an pirtûkek bi zimanê Erebi, bi navê ((Çiyayê Lêlûn di nînika dîrokê de)) hat belavkirin. Nivîskar Mamoste Merwan Berkat ew afrandiyê, û tê de li ser perçakî ji navça Efrînê daxive.

Pirtûk ji 240 rûpelî pêk tê. Pelên wê ji pîvana orte ne /20*14/ cm. Û wek li ser qaba pirtûk ya hundurîn hatiye nivîsandin, ew: ((Lêkolîneke ciyolocî, dîrokî, şûnewarî, civakî û belgekarî ye)).

Pirtûk bi şeweya klasîkî nehatiye dabeş kirin, tenê navnîşanên qaling û bendikên wan di bin re hatine danîn.

Navnîşanên qaling ev in:

- Wateya navê Lêlûn.
- Bingeha ciyolocî ya Ç.Lêlûn.
- Xaknîgariya xwezayî.
- Ç.Lêlûn di dîrokê de.
- Jiyana olî li Ç.Lêlûn.

- Şûnewarên girin û şengeh.
- Rêkên kevin.
- Sedemên malbarkirinê.
- Ziman.
- Adet li Ç.Lêlûn.
- Jiyana aborî.
- Rêk û rewşa çûnhatinê.
- Geştevanî li Ç.Lêlûn.

Pişt ku me pirtûk hûrik hûrik xwend, di nav rûpel û zanişwerên wê de gerîn, û li gor zanebûna xwe, em bawer dikin, ku me çend têbînan li ser naveroka wê pirtûkê girtin:

1. Ji hêla derhênanê de: Naveroka pirtûkê nehatiye dabeşkirin, bir, derî tê de binav nebûne, hema tenê navnîşanên sereke danîne. Ji bilî wê, destpêka xêza yekê ji her bendekê pêşde nehatiye dan, û di navbera bendikan de jî hinek valahî nehatiye hîştin. Ev jî ji hêla derhênanana hunerî de kêmanî ne.

2. Nivîskar di pêşgotinê de (rûpel 10) dibêje, ku amadekirina pirtûkê çend salan dirêj kiriye, û xuyan dike, ku sedemê jî hindikbûna jêderên li ser Çiyayê Lêlûn bû. Lê belê, wek ez dibînim, belkî li seranserî Sûryayê, Çiyayê Lêlûn (Sem'an) ji deverên şûnewarî yên herî nas û navdar e, ku bi dehan nivîser û pirtûk li ser hatine nivîsandin. Yanê gengaz hebû pirtûk ji hêla dîrokî û şûnewarî de zengîn biba.

3. Nivîskar li ser navê (Lêlûn) di rûpela dozdan de, û (Şêrewa) di rûpela pazdan de, dibêje: Bêguman ew yekser dbêje ku ew navine Kurdî ne, lê belê, pişt re ew çend vebjarteyan ji wateya wan re datîne, û nikane bibire, eger wateyên wan navan Kurdî ne ya na. Ji wê bêtir ew dibêje: Belkî Şêrewa navê Xwedêyekî Aşorî be. Yanê belkî ew navekî Aşorî be, yanê belkî ew ne Kurdî be jî.

4. Pirseke xaknîgarî ye giring heye di pirtûkê de şaş hatiye nasandin.

Yek: Ew devera Çiyayê Şêrewa bi çiyayê Lêlûn bi nav dike, û ya rast jî, Şêrewa beşeke ji çiyayê Lêlûn û ne tevahiya wî ye. Ji ber ku Robarliq û Tatliq jî ji Lêlûn tên jimartin. Ji ber wê jî, dema ku nivîskar gelî û newalên Ç.Lêlûn dijmêre û salix dide, yên ji gundê Kurzêlê û bakur de, ta Serê Kaniyê (kefercenê) bibîr nîne, digel ku ew jî ji Ç.Lêlûn in. Û gundên: Me'riskê, Mezre'ê, 'Înabkê û Mêremînê ku li ser Çiyayê Lêlûn in, ew jî nehatine bibîranîn.

Didu: Bilindahiyên ku ji gundê Xezîwê de ta gundê Dêrbelûtê dirêj dibin, ji Lêlûn najimêre, û çêre wî nabê digel ku ew jî beşek in ji çiyayê Lêlûn.

5. Di beşê Ciyolocî de, hin tîrm û biwêj bikar hatine, xwendevanên ne pispor jê tînegihên, mîna: Pêtrogirafya /rûp 18/, Lêsolocî /rup 19/.

6. Nivîskar dibêje, Lêlûn beşek e ji Çiyayê Kurmênc. Lê ez tînegihîştîm çawa beşek

e? Eger ji aliyê kargêrî ve ye, erê rast e, lê eger ji alîne din ve be, pêdvî bi diyarkirinê hebû?

7. Şaşiyeke mezin di binavkirina serdeman de heye. Wî beşên dîrokî parve du biran kiriye û ji serdemên berî afrandina nivîsê re dibêje "serdemên berî dîrokî", lê ya rast, ew "serdemên berî dîrokê" ne, ji ber ku "serdemên dîrokî", ji dema afrandina nivîsandinê de dest pê dikin, yanê ji dema ku merov nivîsiye û dîroka xwe bi riya nivîsandinê daye nasîn. Yanê serdemên berî afrandina nivîsê, ew ên (berî dîrokê) ne.

8. Di rûpela 51an de hatiye: Kûraniya şikefta Duderiyê 60m e û berê wê 40 m e. Û di rûpela 63an de jî hatiye: Ku rûbera şikefta Duderiyê wiha ye ($60 \times 40 = 240 \text{ m}^2$), ev hesab jî şaş e. Lê jê diyar dibe ku, kûraniya duderiyê 40 m e û berê wê 6 m in, û ya rast jî ev e. Sedema şaşiye jî, belkî ji ber ku nivîskar ew zanişwer ji jêdereke şaş biribe, û baş lê nenihêrî be.

9. Di rûpela 65an de, dibêje ((Birasoz)) bi wateya الأخ المحب, lê ya rast الأخ المخلص.

10. Di rûpela 69an de, dibeje gundê (Şeştira) li ser Ç. Lêlûn heye, lê negotiye ew gund li kû dikeve?

11. Anîna deqên nameyên dîrokî di navbera paşayên kevin de, ji lêkolînê re ne ewqas giring û pêwîst bû. Wan tenê rûpel zêde kirine.

12. Pir li ser Xwedêyê Royê hatiye rawestan, lê nizanim çima ew bi navê xwe ye navdar, yanê bi ((Mîsra)) binav nebûye? Digel baş nas e jî, ku Mîsra Xwedêyê Royê û Heqîqetê ye û Xwedêyekî Horî ye. Ji bilî wê, wî pir li ser Fer'on Exnatûn û Xwedêyê Royê denkiyê, di baweriya me de ew jî, dûrî mijara pirtûkê ye û berê mera ji Lêlûn diguhêre.

13. Di rûpela 148an de, Dêr Sem'ana ku li ser hatiye peyvîn, ne ya ku li kêleka Kela Sem'anê ye. Ew yeke dine li navça Mî'rê ye.

Xelîfeta Umewî Umer bin Ebdil Ezîz lê hatiye veşartin.

14. Li ser valabûna çiyayê Lêlûn di sedsala / 7 û 8/an zayînî de, di rûpela 213an de hatiye, ku ew bi sedema şerê Farisan vala bibûn. Lê belê şerê Farisan ê dawîn li derdora Helebê, li dawîya sedsala 6an bi Bîzentiyan re bû. Ê gelek jêderên rastgo jî dibêjin, ku sedema îjdil û yekser ji valabûnê re hatina mislimana ye, û pişt re jî şerên di navbera mislimanan û xaçenasan de radibûn, bû.

15. Di rûpela 215an de hatiye, ku gorên hevbeş hene, ew li kû ne, me nebihîstiyê û nedîtine û li ser jî nexwendiyê.

16. Ji hêla stîla nivîsandinê de jî hin kêmanî hene, yê ku pirtûkê bixwîne dê pir rastê werê û bi lawaziya stîla wê hestewar bibe.

Lê belê, em baş dizanin, ku tiştêkî bêkêmanî nîne, nemaze di warê lêkolînên dîrokî û civakî de, ji ber ku gelek tişt di wan waran de hene merov bêçare û destgirêdayî dikin,

mîna peydakirina jêderên nivîskî yên rastgo, gumandariyên di hewaldanên devkî de... û hwd jî. Ji bilî ku M.Berekat bi xwe jî ne pisporê wan mijara ye, lê dîsa mala wî ava, wekî ku ev berhem bi roniyê xist, û ev penda Kurdî pêk anî: ((Ên destê mera bikin, dê û bavê mera nakin)). Birastê, wî bi rikberî û westana xwe ya giran, kanî bû ev berhem bigihanda ber destên me, û quncikek ji taritiya ku di welatê me hatiye werdan, bi mûmekê ronî bikira.

Ji ber wê jî, û ligel ku gelek zaniyar, lêkolênvan û rojhilatnasan li derbarî Ç.Lêlûn nivîsîne, lê şamîkirineke vê pirtûkê ye cuda heye, dihêle ku merov wê ji rûpela destpêkê de û ta ya dawiyê bê rawestan û bê westan bixwîne. Ji ber ku, ev pirtûka yêkê ye wilo bi hûrikî li ser Ç.Lêlûm axiviye, mafê merovan û mafê axê jî dayê, mafê miriyan û yê zindiyan jî dayê, û bi wê yekê, ev pirtûk

bûye kutikê nifûsê û dapiyan
ji rûniştvanên çiyayê Lêlûn re.

Lê belê, mijara ku bêtir bala
mera dikîşne, mijara rewşên
çiyayê Lêlûn ên olî û şûnewarî
ye. Ez bawer nakim ku ta niha
tikes wilo bi hûrikî li ser
ranewestiye û nepyivî ye.

Hêjayî gotinê ye em bêjin,
ku rêzdar M.Berekat bi xwe jî
ji Ç.Lêlûn e, li gundê
Soxanekê hatiye dinê û lê dijî.
Ji ber wê jî, ew li deverên
çiyayê xwe bost bi bost
geriye, merovên devera xwe
yek bi yek nas kirine û
şûnewarên Ç.Lêlûn jî yek bi
yek dîtine û çav lê kiriye.



Ji Kovara Pirsê Ya Hêja Re

Berî hertiştî, sipas ji desteya birêvebirina wê re li ser van çend hejmarên dertên. Xuya dibe ku, guhdanek ji berê bêtir li derçûna wê tê dandin.

Birayên hêja piştî ku, min çavên xwe di nav rûpelên hejmara çelî re gerandin, navnîşanên henî û hinde keriyên bijarte ji nav mijarên wê xwendin. Çavên min li gotina desteya kovarê ya ku, di rûpela (44)an de ya di destpêka mijara mamoste Zamdarê Zindî de ket, û bala min ber xwe kişand, wê balkişandinê hîşt ku, ez mijara “Nivîsandin” ya mamostê ku me li jor bi navkirî bixwînim, û hindê têbînan ji Pirsê re li jêr rêz bikim. Belkîm ev çend têbînan bi kêrî stîl, rastnivîs û hevoksaziya zimanê me yê şêrîn û xweşik ya mîna ava kaniyên gelî û çiyayên kurdistanê li ba hemî xwenerên kovara Pirsê û bi taybetî li ba mamoste Zamdarê Zindî werin.

- Pêşî, biryara ku, desteya birêvebirina kovara Pirsê standî, ku carina hin gotaran bêyî dest

pê bide biweşîne – şaş e. Ji ber ku, stubariya wê ye ku, şaşiyên çap û vekîte rast bike û hevokan li dûzan bixe. Û belkîm pir mijar û gotar hene eger mirov serast neke wê ji mijara (Nivîsandin) zelûtir bin.

- Her zimanek ducureyî ye, devkî û nivîskî, zimanê devkî timî berî yê nivîskî destpêbûye. Gelek ziman devkiya wê ji nivîskiya wê hinekî cudaye. Lê kêma ji wan devkî û nivîskiya wan weke hevîn, yanê çawa tene bilêvkirin weha jî tene nivîsandin. Zimanê me yê kurdî yek ji wan zimanên hindike. Zatirê, hêsanbûn û xweşikbûna zimanê me di wê taybetmendiyê de ye.

- Her gotarek di hemî zimanan de pêşgotin, mijar û paşgotinek wê heye. Divê hev hersê stûnên gotarê bi hev ve girêdayî bin. Ji ber ku, dema girêdan tune be, qelafeta wê gotarê ji ber hev dikeve û namîne gotar, û ew weke agahiyan xuyan dibe.

- Divê nivîskar pir bixwîne û kêma binivîse. Yanê ne xeme bi

pir zimanan bixwîne û agahiyan jê werbigire. Lê, pêwîst e bêtirîn bi zimanê ku dinivîsîne bixwîne. Ji ber ku, nivîsandina zimanê kurdî hîn di destpêka xwe de ye.

- Her zimanek xudan hevoksazî û rastnivîs e. Rastnivîs û hevoksaziya nivîsandinê, beşekî zor pêwîst ji rêzimên e, ji ber ku çiqas nivîsandina gotar û mijaran baş li hev hûnandî be; ewqas naverok, raman û wateya wan zû dighêje xwêneran. Weke mirov li şûna “ez hatim gund”, “ez gund hatim” binivîsê. Ji vê nimûnê xuyan nabe ku herdu yek wate ne.

- Tu ziman bê ferheng tune ye. Herweha mirovê ku, bixwaze baş bi zimanekî binivîse, divê ferhengoka wî zengîn be. Netenê weha jî divê rast her bêjekê li gor wateya wê di hevokê de bi kar wîne. Nimûne: Ez nizanim mamoste Zandar gotina “Aya” û “aya bîrdoz” xwestî bi çi wateyê di wan ciyan de ji mijarê wîne. Wêlomê di hin dervan de ez pir têngihîştî wateya hin hevokên mijara nivîsandin.

- Tişteki pir baş e ku, mirov di warê wergerandinê de bixebite û bibêje min wergerandî. Wergrandin bi xwe jî dewlemendiyê dide çand, tore û zimanê miletan. Yanê çand, tore û zimanê ku li ser zimanên cîhanê ne vekirî be, li şûn dimîne. Lê, wergerandin zanebûnek jêre divê. Yanê mirovê ku dixwaze ji zimanekî wergerîne zimanek din. **Yek:** Divê baş bi herdu zimana zanibe. **Dudu:** Mijarê baş bixwîne, naveroka wê hilîne û paşê wê naverokê li gor hevoksaziya zimanê din birêse. Ne ku, mijarê bide ber xwe, û her gotinekê ji zimanê ku dixwaze wergerîne yê din. Weha mijara hatî wergerandin ji ber hev dikeve û mirov zû têngahê naveroka wê.

- Mirovê ku dixwaze fêrî tişteki bibe, divê têbîn û rexnên derdora xwe bipejirîne, ev yek ji me tevan re pêwîst e.

Li dawiyê ez bi hêvî me hûn û mamoste Zandarê Zindî li min biborînin, ger ez li hin têbînan şaş çû bim. Dîsa sipas ji we re.

Sandêr: Dilsozê Dozê